



K.T.

Zanîngeha Artuklu ya Mêrdînê
Enstîtuya Zimanên Zindî Yên li Tirkîyeyê
Şaxa Makezanista Ziman û Çanda Kurdî

Projeya Lîsansa Bilind a Bêtez

FERHENGÊN KURDÎ YÊN ONLINE
-LÊKOLÎNEKE ÇENDANÎ-

Têkoşîn AYDENÎZ
18721006

Şêwirmend
Dr. Tareq Mohammed AWRAHIM

Mêrdîn 2020

K.T.

Zanîngeha Artuklu ya Mêrdînê
Enstîtuya Zimanên Zindî Yên li Tirkîyeyê
Şaxa Makezanista Ziman û Çanda Kurdî

Projeya Lîsansa Bilind a Bêtez

FERHENGÊN KURDÎ YÊN ONLINE
-LÊKOLÎNEKE ÇENDANÎ-

Têkoşîn AYDENÎZ
18721006

Şêwirmend
Dr. Tareq Mohammed AWRAHIM

Mêrdîn 2020

PÊŞGOTIN

Ferheng, gencîneya peyvên zimanekî ne. Di zimanekî da sê stûn hatine dîyarkirin ku yek ji wan stûnan jî ferhengên wî zimanî ne. Ferheng bi tevî stûnên din -alfabe û rêziman- ra di pêvajoya demê da dibe hilgirê peyvên zimên. Bi saya ferhengan peyvên ku dihên tomarkirin, ji windabûnê rizgar dibin û digihîjin nîfşên nû. Di heman demê da ferheng ji bo kesên bixwazin wî zimanê fêr bibin an wateya peyvên di zimên da baştir fahm bikin, çavkanîyên sereke ne. Her netewe xwestîye gencîneya zimanê xwe tomar bike û bi rêya perwerdeyê, vê gencîneyê veguhezîne nîfşên nû. Bi vî awayî di demên cîyawaz da ferheng nivîsîne û li hember demê karibûne peyvên zimanê xwe biparêzin. “Di van deman da ku neteweyên dî dûwayî li xebata xwe ya li ser vê axa pîr anîne û dest bi xebata li ser asîmanan kirine, tişteki dilêşin e ku mirov hêj bi ziman û sererastkirina ziman û wekhevkirina ziman xerîk be. Lewre ziman, di hîmê medenîyeta mirovîyê da kevirê pêşîn e.”¹ Ji bo kevirê pêşîn yê medenîyetê an ji bo zimanê zikmakî di sedsala 20an da xebatên alfabe, rêziman û hwd. hatin kirin û hîmê zimanê kurdî xurt hat avêtin. Li ser vê hîmê xurt, li gor daxwaza demê ji aliyên sazî û kesan ve xebatên zimanê zikmakî her berdewam bûn.

Bi derfetên serdema înfomatîkê ra ji bo zîmanê kurdî xebatên li ser ferhengê hatine kirin, derbasî li ser înternetê bûn. Bi saya înternetê, ferhengê kurdî yên online ji herkesî ra û di her demê da gihanîya wan pêkan bû. Lêkolînên li ser ferhengan dihên kirin, têkildarî qada ferhengnasîyê ne ku di van salên dawî da wek zanisteke serbixwe xebatên xwe dimeşîne. Di vê xebatê da ferhengên kurdî yên online di nav çarçoveya ferhengnasîyê da hat lêkolîn kirin. Dê bihê dîtî ku zimanê kurdî ku hîn jî bi metirsîyan ra rûbirû ye çawa ji înternetê sûd wergirt. Îdîaya me ew e ku înternet an geşedanên vê serdema înfomatîkê rê li ber zimanê kurdî vedikin û derfeteke girîng ji bo zimên dabîn dikin. Ji ber vê yekê me di beşa yekem da ferhengnasî, cureyên ferhengan û bikaranîna înternetê pênase kir û dan nasîn. Di beşa duyem da ferhengên kurdî yên online yek bi yek taybetiyên wan hatin pêşkêş kirin û cîyawazîyên wan raxist berçavan. Armanca me ya sereke ew e ku bi danasîna van ferhengên kurdî yên li ser înternetê sûd bihê wergirtin û di demên pêş da baştirîn xebat li ser van ferhengên kurdî yên online bihê kirin.

¹ Komeleya Kurd Ji bo Belavkirina Zanîne û Weşanan” (Kürd Tamim-i Maarif ve Neşriyat Cemiyeti), wer. Mehmet Emîn Bozarşlan, Kovara jîn, 1919, Stenbol, j.10

Ez dixwazim sipasîyên xwe yê taybet pêşkêşî Doç.Dr. Tahirhan Aydın bikim, ji ber ku di projeya min ya yekem da bi pêşniyarên xwe ve alîkarîya min kir û domandina vê xebatê dabîn kir. Dîsa sipasîyên germ ji bo mamoste Dr. Tareq Mohammed AWRAHIM pêşkêş dikim. Her wiha sipasîyên xwe yê germ ji bo mamosteyên hêja û hevalên biqîmet Huseyn Koçuk û Yilmaz Acar ra dikim ku ji ber ked û alîkarîya wan a di amadekirina vê xebatê da. Di dawîyê da spasîyeke mezin ji bo dayîka min a qedirbilind ku di vê pêvajoyê da bi dûayên xwe ve, qedandina projeya min pêkan kir.

Têkoşîn AYDENİZ

Mêrdîn 2020

KURTE

Di destpêka sed sala 21an da bi saya înternetê, dijîtalîzekirina ferhangan dest pê kir û ferhengên dijîtal wek cureyek nû di qada ferhengnasîyê da cihê xwe girt. Di nav çarçoveya ferhengnasîyê da em dê lê binihêrin ku her çendî kurd ne xwedî zimanekî perwerdehîyê ne, çawa ji înternetê sûd wergirt. Armanca lêkolînê ya sereke ev e ku xebatên li ser ferhengên kurdî yên online hatine çêkirin raxe ber çavan û bide nasîn. Her çiqas li ser vê mijarê lêkolînên taybet nehatine kirin jî li gorî agahîyên berdest yekem ferhenga kurdî di sala 2004an da hatiye dijîtalîzekirin. Lêkolîna me bi giştî ji destpêka vê salê heta roja îro, li ser ferhengên kurdî yên online yên li ser înternetê niha çalak in dê raweste. Di xebatê da em dê hewil bidin li gorî metodeke çendanî pirsên: “1. Ji aliyê hejmara bêjeyan ve çi cîyawazî di navbera van ferhangan da heye? 2. Bi kîjan zaravayên kurdî hatine nivîsîn? 3. Ji aliyê kê ve kengî hatine saz kirin? 4. Çavkanîyên xwe çawa bi dest xistine? 5. Polîtîkayên weşanê û berfirehkirina bêjeyên ferhengên online çi ne?” bi giştî bibersivînin.

Bêjeyên sereke: Înternet, Ferhengnasî, Ferhengên Online, Dijîtalezekirina Ferhengên Kurdî

ÖZET

21. yüzyılın başında, internet sayesinde sözlüklerin dijital ortama geçişi başladı ve sözlükbilim alanında yeni bir tür olan dijital sözlükler ortaya çıktı. Bu çalışma ile sözlükbilim çerçevesinde kürtlerin bir eğitim diline sahip olmamalarına rağmen, internetten nasıl yararlandıklarına bakacağız. Araştırmanın temel amacı, online (çevrimiçi) kürtçe sözlükler alanında yapılan çalışmaları tanıtmak ve göz önüne sermektir. Bu konu ile ilgili özel bir araştırma yapılmamasına karşın, mevcut bilgilere göre ilk kürtçe sözlük 2004 yılında dijitalleştirilmiştir. Araştırmamız genel olarak bu yıldan günümüze kadar internette aktif olarak yer alan çevrimiçi kürtçe sözlükler üzerinde duracaktır. Bu çalışmada nicel araştırma yöntemleri ile genel olarak: “1.Kelime sayısı ve büyüklük açısından sözlükler arasındaki farklar nelerdir? 2. Bu sözlükler Kürtçenin hangi lehçelerini içinde barındırmaktadır? 3. Sözlükler kim tarafından ve ne zaman hazırlandı? 4. Sözlüğün kaynakları nelerdir? 5. Sözlüğün kelimelerinin genişletilmesi ve yayın politikası nedir?” sorularına cevap verilecektir.

Anahtar Kelimeler: İnternet, Sözlükbilim, Çevrimiçi Sözlükler, Online Kürtçe Sözlükler

ABSTRACT

At the beginning of the 21st century, the thanks to internet changeover of the dictionary to the digital environment has began and the digital dictionaries emerged in the field of lexicography. By this source with in the framework of lexicography will look, despite of kurds haven't education with mather tongue how to use internet.

The main purpose of the serch introducing reserach of the field of the online kurdish dictionary and focus on although nothing specific research has been carried out on this issue, according the information in the, the first kurdish dictionary was digitized in 2004.

Our research generally will qive point to online dictionary in the internet, date from 2004 to nowadays active. By this research, we can ask about by quantitive research methods generally: 1. In terms of number of world on a size waht are differences between dictionary?, 2. Tehese dictionary which dialects of kurdish host?, 3. Tehese dictionary published by whose?, 4. Waht are resources dictionary?, 5. What are policies for publishing and expanding vocabulary of online dictionaries?

Key Words: Internet, Lexicography, Online dictionaries, Digitalization of kurdish dictionaries

NAVEROK

PÊŞGOTIN	I
KURTE	III
ÖZET	IV
ABSTRACT	V
NAVEROK	VI
KURTEBÊJE	VIII
DESTPÊK	1
1. Problema Xebatê	2
2. Armanca Xebatê	2
3. Girîngîya Xebatê	3
4. Pêşqebûlên Xebatê	4
5. Sînorên Xebatê	4
6. Çavkanî û Rêbaz	4
7. Danasîna Hin Têgehên Taybet ên Vê Xebatê	5
BEŞA YEKEM	7
FERHENG Ê FERHENGNASÎ	7
1.1. Ferheng û Ferhengnasî	7
1.2. Cûreyên Ferhengan	9
1.2.1. Ferhengên Yek Zimanî	10
1.2.2. Ferhengên Du Zimanî.....	10
1.2.3. Ferhengên Kaxizî (Ferhengên awayên pirtûkî)	11
1.2.4. Ferhengên Elektronîk	12
1.3. Ferhengên Elektronîk yên Online	13
1.4. Ferhengên Kurdî û Bikaranîna Înternetê	14
BEŞA DUYEM	17
FERHENGÊN KURDÎ YÊN ONLINE	17

2.1. Wikiferheng	17
2.2. The Kurdish Dictionary	30
2.3. MyMemory Translated	32
2.4. Glosbe Translated	35
2.5. Google Translated	40
2.6. Ferhenga Enstituya kurdî ya Parîsê	42
2.7. Ferhenga Tirşik Netê	43
2.8. Ferheng Akademik	47
2.9. Ferhenga Zaravên Teknîkî.....	49
2.10. Ferhenga Hakkarim	52
2.11. Ferhenga Zkurd.....	53
2.12. Ferhenga Microsoftê	54
2.13. Ferheng.org	56
2.13.1. Legerin.ferheng.org	56
2.13.2. Tools.ferheng.org	57
2.14. Ferhenga Kurdonline	57
2.15. Ferhenga Kurdî Tirkî	59
ENCAM Û NIRXANDIN.....	62
ÇAVKANÎ	65

KURTEBÊJE

<i>amd.</i>	Amadekar
<i>b.</i>	Berg
<i>bnr.</i>	Binihêre
<i>ç.</i>	Çap
<i>hwd.</i>	Her Wekî Din
<i>j.</i>	Jimare
<i>r.</i>	Rûpel
<i>s.s.</i>	sedsal
TDK	Türk Dil Kurumu (Sazîya Zimanê Tirkî)
TMMOB	Türk Mühendis ve Mimar Odaları Birliđi (Yekâtîya Odeyên Endezyar û Avahîsazên Tirk)
<i>vgz.</i>	Veguhêzer
<i>wer.</i>	Wergêr
<i>weş.</i>	weşanxane
YE	Yektîyîya Ewrûpayê

DESTPÊK

Xebatên li ser ferhengê ji aliyê sumeriyân û çîniyan ve heta berî zayînê² diçe. Peyra gelên wek yûnan, ereb, faris û tirk jî di dîroka ferhengnasiyê da xebatên xwe di demên ciyawaz da derxistine holê û ferhengên cur bi cur nivîsandine. Dîroka nivîsandina ferhenga kurdî jî li gorî agahiyên ber dest, heta sed sala 17'an diçe ku ji aliyê Ewliya Çelebî (1611-1682)³ ve lîsteya bêjeyên kurdî hatine kom kirin. Lê xebata wek ferheng dihê hesabkirin ji aliyê Ehmedê Xanî (1651-1709) ve cara yekem hatiye nivîsandin. Xanî bi navê *Nûbihara Biçûkan* ferhengeke menzûm erebî – kurdî û kurdî – erebî ji bo perwerdeya zarokên kurdan nivîsandiye. Li ser ferhenga kurdî li Ewropayê xebata yekem ferhengoka Garzonî ye û piştê jî zimannas M.Alexandre Jaba (1801-1894) ferhenga kurdî-fransî amade kiriye.

Van salên dawî ev xebatên ferhengê bi geşedanên înfomatîkê cihê nivîsandina xwe guherandin. Bi vî awayî tomarkirin û parvekirina daneyên ferhengî bi awayên cur bi cur pêkan bû. Bi dijitalizekirina ferhengan ra em rastî cureyên wek ferhengên offline (derhêl) û online (serhêl) di qada ferhengnasiyê da dihên. Ji 2004an pêve ferhengên kurdî yên online ku niha hejmara wan ji dehan zêdetir e li ser înternetê çalak in dihên dîtin. Bikarhênerên van ferhengan bi saya gihaniya (erişim) înternetê li her derê û di her demê da dikarin ferhengên online bi kar bînin.

Google Translated ku bi sedî zêdetir zimanên cihanê ve karê wergerê dike ji 2016an pêve cih da zimanê kurdî jî. Xebatên li ser ferhengên kurdî yên online ji Wikîferhengê heta Google Translated çî bi şexsî be çî bi sazî (organization) be her ku çûne zêdetir bûne. Di vê lêkolînê da em dê cih bidin di maweya van salan da li ser ferhengên kurdî yên online çî xebat hatine kirin û van ferhengên kurdî yên online bi berfirehî bidin nasîn û raxin ber çavan. Xebat hewil dide ku di bin zanista ferhengnasiyê da cihê van ferhengan dîyar bike û yek bi yek li ser taybetîyên wan raweste.

² Nusrttin Bolleli, Nurettin Ertekin, Ferhengên Menzûm Di Edebîyata Kurdî De, Bingöl Üniversitesi Yaşayan Diller Enstitüsü Dergisi, 2017, Bingöl, b. 3, j. 5

³Martin van Bruinessen, Onyedinci Yüzyılda Kürtler ve Dilleri: Kürt Lehçeleri Üzerine Evliya Çelebinin Notları, Studia Kurdica, 1985, Paris, j.1-3, r.13

1. Problema Xebatê

Ev xebat li ser diwanzdeh ferhengên kurdî yê online disekine û hewil dide ku taybetiyê van ferhengan bi ciyawaziya wan ve nîşan bide. Di nav çarçoveya ferhengnasiyê da cihê wan ên di binê ferhengên dijîtal da dê bihê dîyar kirin.

2. Armanca Xebatê

Armanca vê xebatê danasîn û nirxandina ferhengên kurdî yê online ne ku di maweya ji destpêka wîkîferhengê heta google translatedê da hatine amadekirin. Gihanîya van ferhengan niha jî li ser internet pêkan e, ku weşana wan her berdewam e. Bi giştî armanca xebatê bersivdayina van pirsan e:

- 1-Ferhengên kurdî yê online çend heb in û çawa dikarin bihên dabeşkirin?
- 2-Ferhengên hatin peydekirin bi kîjan zaravayê (n) kurdî di xwe da dihewînin?
- 3-Ji aliyê hejmarê bêjeyan ve cudahiya mezinahiya ferhengên kurdî yê online çi ye?
- 4-Ev ferhengên kurdî yê online ji aliyê kê ve û kengî hatine sazkirin?
- 5-Çavkaniyên ferhengan çi ne û ev çavkanî (yan) çawa bi dest xistine?
- 6-Polîtîkayên weşanê û berfirehkirina bêjeyên ferhengên kurdî yê online çi ne?

Wek li jorê hat diyarkirin, me taybetiyên li ser ferhengên kurdî yê online bi şeş pirsên sereke vekolîn kir. Ji xeynê van taybetiyên berbiçav taybetiyên ku ferhengên online di xwe da dihewînin derxist pêş. Xebat bi giştî li ser van têgehên jêrîn lêkolîna xwe meşandiye:

Ferheng: Ferheng; gencîneya peyvên zimanekî yan zimanan e⁴. Di ferhengê da peyv bi awayên vegotin û nivîsandinên xwe, bikaranîna wan di cihên cuda de û wateyên wan li gor alfabe yê dihên rêzkirin. Her wiha wateyên wan bi hemanên rayek, zayend, rêziman û hwd. ra erkên peyvvan ên cihêreng destnîşan dikin.

Ferhengnasî: Her cure lêkolînên derbarê ferhengan da û têkildarî amadekirina ferhengê da karên dihên kirin, wekî dîsîplînek serbixwe bi navê ferhengnasî dihê pênasekirin.⁵ Ferhengnasî ku wekî zanista ferhengê dihê pênasekirin, du qadên bi navên lêkolînên ferhengê (Dictionary research) û amadekirina ferhengê (Dictionary Making) ve dihê dabeşkirin.

⁴ Umit Işık, Lêkolînek Li Ser Ferhengên Kurdî (1655 – 1990), Muş Alparslan Üniversitesi Sosyal Bilimler Dergisi, 2015, Bingöl, b.3, j.1, r.156

⁵ Sami Baskin, Türkiye ve Dünyada Sözlük Bilimi: Tanımı, Kapsamı ve Diğer Bilimlerle ilişkisi, International Journal of Language Academy, 2014, Tokat, b.2, j.4, r.453

Cûreyên ferhengan: Dabeşkirina ferhengan di gelek waran da bihên kirin jî piranî bikarhênerên ferhengan rastî van cureyan dihên; ferhengên yek an du zimanî, ferhengên çapkirî û ferhengên dijîtal⁶. Bi dehan cureyên ferhengan, di sisê an çar cureyan da komkirina wan pêkan e.

Ferhengên dijîtal: Bi geşedanên teknolojîyê ve cihê nivîsandina ferhengan guherî û li ser cîhazên dijîtal hatin tomarkirin. Du cureyên ferhengên dijîtal yên serhêl (online) û derhêl (offline) hene. Ferhengên dijîtalî yên offline, ferhengên li cîhazên cuda yên elektronîkî hatine komkirin û tomarkirin. Yên online jî ferhengên ku bi gihanîya înternetê li her dem û her cihî bikaranîna wan pêkan e ra dihê digotin.

Înternet: Toreke pir fireh e ku di navbeyna kompûteran da li seranserê cihanê belav bûye. Bi van torên ragihandinê li ser înternetê dosyeyên wêne, muzîk, tekst û hwd. li her derê cihanê dikarin bihên parvekirin. Di destpêka salên 1960î da dest bi geşedanê kiriye ku ev jî encama xebatên Wezareta Parastinê ya DYE (Dewletên Yekbuyî yên Emerîkayê) ye.

Ferhengên online: Cureyek ji ferhengên dijîtal e ku bi gihanîya înternetê li her derê û her wextê da bikaranîna wan pêkan e. Ferhengên online, ku di destpêka s.s. 21an da li cihanê dest bi weşanê kir ji aliyê sazî û kesan va dihên amadekirin.

3. Girîngîya Xebatê

Herçendî zimanê kurdî ne zimanê perwerdeyê ye û ji ber hin sedemên dîrokî û civakî bi salan qedexekirî maye, kurd niha di vê serdema teknolojîyê da ji bo zimanê zikmakî derfetine mezin bi kar tîne. Ji van derfetan ya herî berbiçav jî ev e: înternet. Em dizanin ku herî dawî sepana Google ya ji sedî zêdetir zimanan wergerê dike, ev sê sal ên dawî, bi zimanê kurdî jî wergerê dike. Ev mînaka Google Translated nîşan dide ku zimanê kurdî di jiyana nûjen da cih girtîye û bi xebatên xeyrî wergerê jî dê cihê xwe bigre. Ji van xebatan yek jî Ferhengên Kurdî yên online in ku nêzikî panzdeh salin li ser înternetê çalak in. Wek dihê zanîn ku sê sutûnên zimên alfabe, rêziman û ferheng in. Ferhengnasî jî wek zanistêke serbixwe di cîhana akademîyê da cihê xwe nû girtiye ku xebatên li ser ferhengê bi awayekî zanistî vedikole. Ev xebata me jî bi metodeke zanistî di nav çarçoveya ferhengnasyê da ferhengên kurdî -lê yên çapkirî na- yên li ser înternetê wekî online barkirî dide nasîn û radixe berçavan.

⁶ Sami Baskin, Gülnur Birol, Sözlük ve Sözlük Kullanıcıları: Hangi Sözlük Kimin İçindir?, Turkish Studies, 2017, Enqere, b.12, j.15, r.153

4. Pêşqebûlên Xebatê

Wiha hatiye qebûlkin ku:

- Rêbaza lêkolînê li armanc, mijar û problemên xebatê dihê ku ev rêbaza çendanî ji bo mijara me guncawtir e.
- Xebat, rasterast li ser înternetê dê bihê vekolînkirin.
- Ji bo agahîyên derbarê ferhengan malperên wan, dê bihê bikaranîn.
- Ferhengên kurdî yên online -ji gulana sala 2004an hetanî kanûna paşîna sala 2020an, ev 15 salên dawî- bi geşedanên serdema enformatîkê ve derketine holê.

5. Sînorên Xebatê

Ev xebat bi ferhengên kurdî yên online ên ji Wikîferhengê heta Google Translated hatine amade kirin ve sînardar e ku li jêr hatine dîyar kirin:

- Wikîferheng, The Kurdish Dictionary, MyMemory Translated,
- Glosbe Translated, Google Translated, Microsoft Language Portal,
- Ferhenga Enstituya Kurdî ya Parîsê, Turkce Kurtce Sozluk, Ferhenga Zkurd
- Ferhenga Akadamîk, Ferheng.org, Ferhenga Zaravên Teknîkî, Hakkarim
- Ferhenga rûsî – kurdî, Ferhenga Suleyman

Bi giştî van ferhengên online ku panzdeh heb in, sînorê xebatê dest nîşan kir.

6. Çavkanî û Rêbaz

Xebata me xebateke çendanî (quantitative) ye, lewre ji bo diyarkirina taybetiyên ferhengên online ji daneyên li ser malperên ferhengên kurdî sûd hatiye wergirtin. Xebata me ji du beşên sereke pêk dihê. Beşa yekem li ser mijarên ferheng û ferhengnasyê, her wiha li ser cureyên ferhengan radiweste. Beşa duyem cih dide metodolojiya xebatê û li gor pirsên diyarkirî taybetiyên ferhengên kurdî yên online dide nîşandan.

Ji ber ku mijara xebatê li dor înternetê dizivire bêtir ji çavkaniyên malperên ferhengan sûd hatiye wergirtin. Lê belê di xebata xwe da me çavkaniyên çapkirî yên der bare ferheng û ferhengnasyê da jî bi kar anî. Di bin banê van agahiyan da xebata me bi piranî xwe dispêre van çavkaniyan. Navnîşanên malperên ferhengan, çavkaniyên bingehîn ên vê xebatê ne. Wek mînak van çavkanîyan;

- Navnîşana wîkîferhengê: <https://ku.wiktionary.org/wiki/Destpêk>,
- Navnîşana ferhenga malpera glosbe: <https://ku.glosbe.com/>
- Navnîşana fehenga google translated: <https://translate.google.com/>

û hwd.

Agahiyên derbarê ferhengdan da ku li ser malperên wan hatine dayîn û nûçeyên derbarê van malperan da ji bo xebata me çavkaniyên yekemîn in.

Dîsa gotarên derbarê ferhengên kurdî da *Lêkolînek Li Ser Ferhengên Kurdî (1655-1990)* ya Umit Işık û *Ferhengên Menzûm Di Edebiyata Kurdî De* ya Nusrettin Boelli jî ji bo beşa yekem a mijarên li ser ferhengên kurdî çavkaniyên bingehîn in.

Ji bo qada ferheng û ferhengnasîyê; *Türkiye ve Dünyada Sözlük Bilimi: Tanımı, Kapsamı ve Diğer Bilimlerle İlişkisi* (Li Tirkîye û Cîhanê Ferhengnasî: Pênase, Vegir û Peywendîya Bi Zanistên Din Ra) ya Sami Baskın, *What is Dictionary?* (Ferheng Çi ye?) a Henning Bergenholtz û *Sözlük ve Sözlük Kulaanıcıları: Hangi Sözlük kimin İçindir?* (Ferheng û Bikarhênerên Ferhengan: Kîjan Ferheng Ji Bo kî Ye?) a Sami Baskın çavkaniyên vê xebatê ne. Ji bo senifandina ferhengên kurdî ji gotara *Elektronik Sözlük Tipolojileri ve Lexica Örneği* (Tîpolojîyên Ferhengên Elektronîkî û Mînaka Lexica) ya Göksel Sert jî sûd hat wergirtin.

7. Danasîna Hin Têgehên Taybet ên Vê Xebatê

Serhêl (Online): Di pergala kompûterê da rewşa girêdayî înternetê ye. Dema bi serverê (pêşkêşkar) va girêdayî hebe, ew dihê wateya ku gihanîya înternetê li dar e û ev rewş wekî serhêl (online) dihê binavkirin.

Derhêl (Offline): Di pergala kompûterê da dema kompûter girêdayî torekê nebe ji vê rewşê ra jî derhêl (offline) dihê gotin. Ger mirov rewşa offline da be, şandina daneyek li ser torê ne pêkan e.

Sepan (Application): Nivîsbarîyên (software) an bernameyên destûrê dide bikarhêneran ku li gorî pêdivîyên xwe karên ku dixwazin pêk bîne. Sepanên qada kompûtergerîyê cur bi cur in û ji bo karên perwerde, aborî, zanist û hwd. dihên bikaranîn.

Malper (Web Site): Rûpelên li ser tora înternetê ne, ku ji zîyaretvanên xwe ra agahiyên di forma tekst, dîtbar û anîmasyonê da vediguhezînin. Her wiha ji komek

dokumentên ku rûpelên xizmetekî pêşkêşî mirov dikin ra malper an sîteyên înternetê dihê gotin.

Danegeh (Database): Cihê tomarkirina agahîyên tşkîldarî hev û rêbaza gihîştîna van agahîyan e. Bi zêdebûna agahîyan ve ji bo hîlanîna van agahîyan û gihîştîna wan li ser kompûterê, rê û rêbazên nû pêwîst bûn. Bi rêbaza danegehê ve bi mîlyonan agahî di cihekî de dikarin bihên parastin û dema bihê xwestin jî di demeke kurt de gihîştîna pêkan e.

BEŞA YEKEM

FERHENG Û FERHENGNASÎ

Di vê beşê da ferheng, ferhengnasî û cureyên ferhengan dê bihên pênasekirin. Her wiha nêrînên derbarê xebatên li ser ferhengê û ferhengnasiyê da dê bihên nîşandan. Ferhengên kurdî û têkilîya wan bi bikaranîna înternetê ve bihê dest nîşankirin.

1.1. Ferheng û Ferhengnasî

Ji ber ku ziman bingeha her tiştî ye, pêwîste qîmeteke gelek mezintir pê bihê danîn. Li gor vê qîmetdayîne ji bo her zimanekî berhemên cuda cuda derdikevin holê. Ferheng jî ji van berheman e ku dema wateya peyvek bihê xwestin an ji bo cihên ku peyv tê da derbas dibin bihê nihêrtin her mirov destê xwe diavêje ferhengên wî zimanî. “Heke ev zimanekî bindest be, ango wekî zimanê kurdî ku hêj nebûye xwedî statûyeke fermî li hemû welatên ku ew tê axaftin, ferhengnûsîya wî di heman demê da wek peywireke sosyo – polîtîk derdikeve holê.”⁷ Ev peywîr di vê serdemê da bi amurên înfomatîkê hêsantir dikare bihê kirin.


Li gel rêzimana zimanekî, gencîneya peyvan a zimanekî jî wek ji girîngtirîn parametreyê zimanekî dihê pejirandin. Şîrovekirina peyvan, xwendin û nivîsandina peyvan, dîyarkirina cureyên peyvan û hwd. di vê gencîneyê da dihê nivîsandin û parastin. Bi saya ferhengê an mirov dikare bibêje gencîneyê, hebûna wî zimanî der tê holê ku peyvên di gencîneyê da tomarkirîne digihîje nîşên nû. “Ji bo zimanekî ku demeke dirêj tenê di asta devkî da maye, ev tê wateya îspatkirina wî zimanî.” Zimanê kurdî, bi ferhengên xwe hebûna xwe teqeztir kiriye.

Ji bo pênasekirina ferhengê cur bi cur pênase hatine kirin û ji bo zimên girîngîya wî her tim hatiye bilêvkirin. Ferhengnas Bergenholtz di gotara *What is a Dictionary?* (Ferhengek çi ye?) da piştî nîqaşên duvdirêj vê pênaseyê bo ferhengê guncaw dibîne: “ Dema pêdivîyek ji bo nivîsîna tekstekê an wergera tekstekê hebe yan jî ji bo derbarê peyvek an rêzepeyvan da

⁷ Bnr. Salih Akin, Pêşgotina ferhenga bi sernavê Dictionnaire kurde – français (ferhenga kurdî - frensî) ya A.Jaba, 2014, weş. Avesta

agahî bihê xwestin, dê bihête şewirîn û xalên hêmanên zimên ên têkildarê ferhengê jî çavkanîyên sereke yê ferhengnasîyê ne.”⁸

Qada xebatê ya bingehîn ya ferhengnasîyê jî ferheng in. Bi kurtasî mirov dikare bibêje ku ferheng jî wekî berhemên, li gor qaîdeyekê peyvên hatine lîstekirin dikare bihê pênase kirin. Xebatkarên ferhengnasîyê bi rêziman, fonolojî, bilêvkirin û hwd. ra ji bo daneyên ferhengê xerîkdarin. Kesên wekî Hartmann û James ferhengnasîyê zanistekî teorîk û sepanî (kuramsal ve uygulamalı) dipejirînin û vê qada zanistê di binê du beşan da dabeş dikin.⁹ Ev dabeşkirina wan di şiklê jêrîn yê amadekirî da hat şênber kirin:



Şikil 1.1. Ferhengnasî: Teorî û Pratîk (Hartman û James, 1998: 86)

Wekî encam bihê gotin, ferhengnasî bi xwedî du qadên serbixwe bi şewazeke zanistî lêkolînên li ser ferhengan ra têkildar e. Xebatên ferhengnasîyê ji aliyê sazî û dezgehên ve ji bo her qadeke ferhengê dihê kirin. Li Tirkiyeyê jî xebatên li ser ferhengê ji aliyê TDK (Sazîya Zimanê Tirkî - SZT) yê ve dihê kirin. Piştî avakirina komarê di salên 1932-34 û 1952-59an da xebatên qadî hatine kirin ku bi rêbaza fişî (fiş yöntemi), peyvên ziman hatine komkirin û duvre ji bo ferhengan hatine bikaranîn. Ji aliyê vê sazîyê ve nêzîkî sed salên komarê da çendîn ferheng hatin amadekirin.

Cara yekem di sala 2014an da dema ferhenga kurdî hat ji aliyê TDKyê ve hat weşandin, serokê TDKyê Prof. Dr. Mustafa S. Kaçalın bi van gotinên jêrîn pêşkêşîya ferhengê kir¹⁰:

⁸ Henning Bergenholtz, What is a Dictionary? (Sözlük Nedir?), wer. Ezgi Corga, Dil ve Edebiyat Araştırmaları Dergisi, 2014, j.10, r.18,

⁹ Baskin, 2014, r.446

¹⁰ Fevzî Karademîr; Nezîr Gumuş; Ahmet Korkut; Sözlük – Ferheng, weş. TDK yayınları, 2014, Enqere

“Li welatê me îro piştî zimanê Tirkî, zimanê ku herî zêde tê axaftin zimanê Kurdî ye. Sazîya Zimanê Tirkî îro ferhenga Kurdî – Tirkî, Tirkî – Kurdî diweşîne. Piştî Wezaretê Perwerdehiya Netewî di dibistana da zimanê kurdî wekî dursa bijarte qebûl kir, hewceyîya bi ferhengeke wiha gelek zêde çêbu.”

Ji aliyê sazîyê ve ji bo amadekirina ferhengê, dersên kurdî yên bijarte roleke sereke leyîstîye. Ev jî nîşan dide ku di perwerdeyê da cihgirtina zimanê kurdî, qada xebatên ferhengên kurdî berhemek nû lê zêde kiriye. Lewre di dîroka komarê da cara yekem ferhengek kurdî ji aliyê sazîyê ve hatiye weşandin.

Lêkolînên ferhengî, li çar aliyên cihanê ji aliyê çend sazîyên pêşeng ve dihên birêvebirin ku navên wan ev in:

- European Association for Lexicography (Eurolex) [Komeleya Ferhengnasîyê ya Ewropayê]
- Dictionary Society of North America (DSNA) [Civata Ferhengnasîyê ya Amerîkaya Bakûrî]
- Africa Association for Lexicography (Afrilex) [Komeleya Ferhengnasîyê ya Afrîkayê]
- Australian Association for Lexicography (Australlex) [Komeleya Ferhengnasîyê ya Awîstralayayê]

Ev sazîyên navneteweyî ji bo pêşketina ferhengnasîyê hewl didin li her derê cihanê xebatên baştir bikin. Ji xeynî van sazîyên navneteweyî hin sazîyên herêmî jî hene ku wekî li jêr me navê wan dan:

- Southeast Asian Lexicography (SeaLex) [Ferhengnasîya Başûrrojhilatê Asyayê]
- Spanish Association Lexicography [Komeleya Ferhengnasîyê ya Îspanyayê]

Nivîskarîya ferhengnûsîya kurdî jî bi awayekî profesyonel di van salên dawî da xebatên hêja derxistine holê. Hinek xebat ji aliyê sazî û dezgehên ve û hin jî ji aliyên şexsan ve karê ferhengnûsîyê hatine kirin û ev xebat hîn jî berdewam in.

Di van salên dawî da bi geşedanên di qada înfomatîkê da ferhengnasî, guherînên mezin derbas kirin. Di nav ferhengnasî û teknolojîya înfomatê da têkilîyek xurt heye ku dema teknolojîya înfomatîkê pêş dikeve ferhengnasî jî hêsantir, erzantir û di demek kurttir de encamên baştir dikare bistin e.

1.2. Cûreyên Ferhengan

Ferheng piranî ji aliyê mamosteyan, xwendekaran, gerokan û wergêran ve dihê bikaranîn. Di dema amadekirina ferhengan da hin xalên girîng li ber çav dihên girtin. Ev xalên girîng; armanca bikaranîna ferhengê, temen, zimanê zikmakî, asta merîtîya zimên û hwd. in.

Ji bo her her astekî û li gor armaca bikaranîna ferhengan amadehîyên ferhengan dihên kirin. Pirsên wekî: kî ferhengê bi kar tînin, bikarhêner kengî û ji bo çî serî li ferhengan didin jî cureyên ferhengê derdixin pêşberî mirov. Ji ber ku di her asta pola xwendinê da peyvên komikan yek nîn in û ji bo pola 5an û pola 9an heman ferheng nikare bihê bikaranîn. Girseya bikarhêneran, ger wateya peyvekî nizanibe, ji bo kîtekirina peyvê ji xwe ne bawer be ango tenê ji bo valahîyeka di gencîneya xwe da heye tije bikin serî li ferhengan didin. Ferhengên piranî dertên hemberî bikarhêneran ev in:

1.2.1. Ferhengên Yek Zimanî

Ferhengên ku wateya peyvan bi zimanê jêger ra dihê nivsîn û xalên (madde) ferhengê bi heman zimanî dihê nivîsandin. Ev ferheng ji bo kesên zimanê zikmakî diaxivin, çavkanîya sereke ye. Ji heftêyî zêdetir cureyên ferhengên yek zimanî dihê dîtin. Bo mînak ferhengên alfabetîk û tematîk yan jî ferhengên akademîk an bazirganî, ferhengên taybet û yên giştî hwd. gelek cure di nav xwe da dihewîne.

Ferhenga biwêjan, ferhenga gotinên pêşîyan, ferhehga hevwaterî, ferhenga dijjwaterî, ferhenga nivîsîna peyvên wan dişibin hev û hwd. di kategorîya ferhengên yek zimanî da dihên pejirandin. Cureyê ferhengên yek zimanî yên herî pir dihê zanîn ferhengên giştî ne. Ferhengên giştî derbarê hem wateya peyvan hem jî peyvên pê ra têkildar da agahî dide bikarhêneran. Yekem ferhenga yek zimanî ya îngîlîzî di s.s 17an da hatiye nivîsîn û bi navê *Kamus-i Türki* jî yekem ferhenga yek zimanî ya tirkî di s.s 19an da hatiye nivîsîn. Yekemîn ferhenga kurdî ya yek zimanî jî di s.s 20an da hatiye nivîsîn. Bi navê *Ferhengî Xal* ji aliyê Muhammed Xal ve di salên 1960, 1964 û 1976 da li Silêmanîyê dihê çapkirin¹¹. Ferheng sê cîld e û tê dapeyvên kurdî dîsa bi zimanê kurdî dihên ravekirin.

1.2.2. Ferhengên Du Zimanî

Dema lîsteya peyvan bihê amadekirin du ziman bihê bikaranîn wek ferhengên du zimanî dihên pênasekirin. Di ferhengan da zimanê xalan ‘zimanê jêger’ yên din wek ‘zimanê armanckirî’ dihê binavkirin. Ferhengê du zimanî gelemperî ji bo wergerê dihên bikaranîn. Yekem ferhenga kurdî Nûbihara Biçûkan (1683) jî du zimanî ye û ji bo pêwîstiyên zarokên kurdan bi zimanê Erebi bo bibe bersivê hatiye nivîsandin¹². Mînakên van cureyên ferhengan li Rojava bi zimanê îngîlîzî di sedsala 15an da hatine nivîsîn. Ferhengên du zimanî yên

¹¹ IŞIK, 2015, r. 163

¹² Prof.Dr. Abdurrahman Adak, Destpêka Edebîyata Kurdî ya Klasîk, 2015, Stenbol, ç. 3, r. 254

îngîlîzî – latînî di sala 1450an da, îngîlîzî – grekî di sala 1547an da û ya îngîlîzî – frensî 1570an da hatine nivîsîn.¹³

Rêbaza ku di van ferhengan da dihê bikaranîn, li ser bingeha *peyv bi peyv* (word to word)yê ye. Di amadekirina ferhengan da rêbaza herî zêde hatiye bikaranîn ev e. Her wiha roja îroyîn da pîranîya ferhengên du zimanî du alî ne. Mînak ferhengên kurdî – tirkî û tirkî kurdî di berhemekê da dihên pêşkêşkirin.

1.2.3. Ferhengên Kaxizî (Ferhengên awayên pirtûkî)

Ger mirov pênaseyên ji bo ferhengê yê heta dawîya sedsala 20an hatine kirin binihêre dê bibîne ku ferheng, di forma pirtûkekê da hatine pênasekirin. Li gor pênaseya Jackson ferheng “pirtûka referansê ya têkildarî peyvan e”¹⁴. Lewra dîroka ferhengên niviskî bi awayê “ferhengên tablet”, “ferhengên neçapkirî”, “ferhengên çapkirî” û “ferhengên elektronîk” geş bûne.

Qesta ji ‘ferhengên pirtûkî’ ev e ku yê ji kaxiz hatine hilberîn yan jî listeyên çendîn peyvan ên kaxiz dihête fehmkirin. Ji xeynî papîrus (kaxizê bi rehên riwekan ve dihên çêkirin) û parşomenê (kaxizê bi çermê ajalên ve dihê çêkirin) dîroka kaxizê ji du hezar salan zêdetir diçe û cara yekem di wateya modern de li Çînê ji aliyê Ts’ ai Lun ve piştî zayînê di sala 105an da hatiye çêkirin. Kaxiz ji sedsala 8an pê ve ji aliyê îranî, tirk, kurd û ereban ve hatiye bikaranîn. Ji ber vê jî ferhengên pêşîn ên van milletan li ser kaxizan hatine nivîsîn û wek pirtûk hatine weşandin. Yekem ferhenga erebî di s.s 8an da ji aliyê el-Halîl b. Ahmed ve bi navê *Kitâbu’l Ayn* hatîye nivîsîn û her wiha ferhenga tirkî ya ji aliyê Mehmûdê Kaşgarî ve jî di s.s 11an da hatîye nivîsîn.

Ji destpêka nivîsandina ferhengên kurdî (s.s 17) heta s.s 19an ferhengên kurdî yê hatine amadekirin jî wekî destxet li ser kaxizan hatine nivîsîn. Her çiqas di sedsala 18an da di çapxaneyan da ferhengên zimanên din (wek mînak ferhenga Vankulu Lugati ya tirkî sala 1726an de) hatibin çapkirin jî ferhengên kurdî heta dawîya sedsala 19an nehatiye çapkirin û wek destxet mane. Di çapxaneyê da cara yekem ferhenga Yuzuf Ziyaeddîn Paşa ya bi navê “el-Hedîyyetu’l-Hemîdîyye fil’l-Luxeti’l-Kurdiyye” li Stenbolê¹⁵ (1894) hatiye çapkirin ku ferhenga Nubihara Biçûkan jî di dawîya vê ferhengê da hatiye bicihkirin.

¹³ BASKIN, 2017, r.145

¹⁴ BASKIN, 2017, r.149

¹⁵ ADAK, 2015, r.255

1.2.4. Ferhengên Elektronîk

Di van pêncî salên dawî da bi geşbûna teknolojiyên enformatîk a bilez ve qada nivîsandina ferhengan hat guhertin. Di awayên cur bi cur de daneyên ferhengî dikarin bihên parastin, şixulandin û parvekirin. Wekî mînak di CD, bîrên veguhêzeran (flash disk û hard disk) û derdorên farazî (virtual environments) da dihên tomarkirin û parvekirin.

Ferhengên elektronîk, wekî yên online û offline bi du cureyan dihên dabeşkirin. Ferhengên elektronîkî yên offline, ferhengên ku di amûrên cur bi cur yên elektronîkî da hatine tomarkirin an hatine parastinê ra dihê gotin. Mînakên ferhengên offline ev in:

- Bernameyên di dîskên wek CD, VCD û DVDyan da hatine hîserkirin (depolama).
- Ferhengên elektronîk yên bi giştî wek ajanda hatine sêwirîn (tasarlama).
- Bernameyên ferhengan yên li komputeran barkirî (yükleme).
- Sepanên yên li telefonên mobîl û tabletan dikarin bihên daxistin (indirme).

Temenên van ferhengên offline, ji aliyê teknolojiyê ve hatine sînordar kirin. Yên demek kurt gelek dihatin bikaranîn CD, VCD û DVD niha edî qet nayên bikaranîn. Lê yên li komputer û telefonên mobîlan dikarin bihên barkirin, bikaranîna wan hîn berdewam in. Ferhengên online ku mijara sereke ya vê lêkolînê ye, li ser pênaseya wê em dê berfirehtir li ser bisekinin. Bi giştî ferhengên elektronîk hem kêmtir cih digirin hem jî pirtir peyv di bîra xwe da dikarin bihewînin. Divê bihê gotin ku cureyê yekem ên ferhengên elektronîk, ferhengên guhêzbar ên destî ne û dikarin bi hêsanî bihên hilgirtin. Ferhengên guhêzbar ên destî jî herî pirtir li Rojhilata Dûr li welatê Japonya hatiye bikaranîn ku di salekî da 3 mîlyon ferheng hatine firotin.¹⁶ Ev ferhengên ku ji aliyê kesên fêrbûna zimanekî biyanî bixwazin ve dihên bikaranîn, piranî ferhengên du zimanî an sê zimanî ne.

Ji aliyê TDKyê ve ku yekem car di sala 2002an *Güncel Türkçe Sözlük* (Ferhenga Tirkî ya Aktûel) hatibû dijîtalîzekirin duvre di sala 2007an¹⁷ da ev ferhenga çapkirî derbasî dîskan jî hat kirin. Wekî berî jî me gotibû ferhenga kurdî – tirkî û tirkî – kurdî ji aliyê vê sazîyê ve di sala 2014an da hatibû weşandin. Her çiqas ev xebat ji bo xwendekarên Dibistanên Seretayî hatibe kirin jî divê bihê zanîn ku di vê serdema dijîtal da ji bo her kes jê sûd wergire û

¹⁶ Goksel Sert, Elektronik Sözlük Tipolojileri ve Lexica Örneği, Uluslararası Türk Dili ve Edebiyatı Araştırmaları Dergisi, 2019, Eskîşehir, b.7, j.17, r.3

¹⁷ SERT, 2019, r.3

gihîştina vê ferhengê hêsantir bibe dijîtalîzekirina wê pêwîst dike. Lewra dê bihê dîtin ku di nav ferhengên kurdî yê online da ev ferheng nayê dîtin ango TDK wek sazî ev ferhenga çapkirî wek online derbasî li ser înternetê nekiriye. Bi navê Zargan, Tureng, Dictionarist û hwd. nêzî bîst ferhengên tirkî yê online ji bo çendîn zimanan hatibin amadekirin jî, heta niha zimanê kurdî li van ferhengan da cih negirtiye.

1.3. Ferhengên Elektronîk yê Online

Ferhengên li cihê gihanîya înternetê hebe ku her kes dikare wan bikarbîne ra ferhengên online dihê gotin. Bi peyanên (girişim) çend sazî û çend kesan ve dihên amadekirin ku li ser malperan gihanîya wan li her derê her dem pêkan e. Bikaranîna van ferhengan pratîktir e ku hilgirtina wan jî ji bo bikarhêneran pirsgirêk dernaxe. Pêşketinên di qada teknolojiyên informatîkê, ji bo ferhengnasîyê derfetên mezin derxist holê ku ferhengên çapkirî cihê xwe ji ferhengên online ra hişt. Bi milyonan nîşeyên bi destan dihatin girtin berîya van geşedanên informatîkê, bi çendîn ferhengên wekî pirtûkan da dihatin nivîsîn û weşandin. Lê niha bi şewazeke bilez û otomatîk ji sed milyoni zêdetir peyvên ferhengê dikevin danegehê û li van peyvên zûtir dikarin bihêngihîştin.

Xwe gihandina ferhengên çapkirî ji her kesî ra ne pêkan e ku ji aliyê xwendevanên van ferhengan ve, pirsgirêka bikaranîna wan jî heye. Ji bo ferhengên online cih ne pirsgirêk e ku li her derê mirov dikare hêsantir wan bi kar bîne. Di destê mirov da komputer, telefona mobîl an tabletek hebe ev bes e ji bo xwe gihandina ferhengê. Her wisa guncawkirina ferhengên çapkirî demeke pir dirêj digire ku ev pirsgirêk di yê online da demeke kurt da bilez dihê çareserkirin. Bikarhênerên wekî mamoste, xwendakarên beşên zimanên biyanî, gerok, wergêr û hwd. ji bo peyvên wateyên wan fêr bibin pîranî ferhengên online hildibijêrin. Ev hilbijartina ferhengên online, bi saya gihanîya înternetê ve xwe zûtir gihaştina wateya peyvên dertê holê.

Di ferhengên çapkirî da, mînakên ji bo wateya peyvên dihatin dayîn sînordar in lê di ferhengên online da ev mînak zêdetir dibin û cihê bikaranîna peyvê cur bi cur dihê nîşandan. Bo mînak di ferhenga kurdî ya Glosbe Translatedê da dema bikarhêner peyva ‘çav’ di ferhengê da lêbigere, 44 cure mînakên wateya peyva ‘çav’ ji bo zimanê tirkî di ferhenga online da dê bikare bibîne. Bi giştî taybetîyên ferhengên online ev in; bikaranîna wan hêsantir, gihaştina wan zûtir û rojanekirina (update) wan leztir e.

1.4. Ferhengên Kurdî û Bikaranîna Înternetê

Wekî berî jî hatibû dîyar kirin ferhengnûsîya kurdî bi Ehmedê Xanî ango di sedsala 17an da dest pê kir. Li Ewrûpayê yekem xebat ji aliyê Garzonî ve hat kirin ku ferhengoka zimanê kurdî di pirtûka *Gramatica E Vocoboloria Della Lingua Kurda* (Rêziman û Ferhenga Kurdî) da bi cih kir. Her wiha ji aliyê zimanzanê M. Augguste Jaba bi navê *Dictionnaire Kurde – Français* ferhenga kurdî – frensî li Rûsyayê hat çapkirin. Li gorî agahiyên ber dest di s.s 17an da du heb, s.s 18an da çar heb û di s.s 19an da jî heşt heb bi gîştî berîya s.s 20an çardeh heb ferhengên kurdî hatine nivîsîn. “Piştî Ehmedî Xanî, Garzonî û Jaba ferhengnûsîya zimanê kurdî di dema tevgera neteweyî ya s.s 20ê da geş dibe ku gelek lêkolîner, nivîskar, helbestkar, filozofên kurd bi awakî kolektîf beşdarî teswîrên peyvên xwe dibin û bi vî awayî li zimanê xwe xwedî derdikevin.”¹⁸ Bi vî awayî hejmara ferhengên kurdî ji destpêka ferhengnûsîya kurdî heta sêlên 1990î ve gihîştîye 45¹⁹ ferhengan. Di roja îroyîn da hejmara ferhengên kurdî her ku diçe zêdetir dibe lê li gor daxwaza demê ev ferhengên çapkirî veguherîne ferhengên elektronîk.

Berîya ku têkilîya ferhengên kurdî û bikaranîna înternetê bihê kirin em dê behsa înternetê bikin û li pêvajoya pêşketina wê binihêrin. Yekem car înternet, di sala 1962an da yek ji zanîngehên herî mezin ên Amerîkayê li zanîngeha Massachusetts Institue of Technology (MIT)yê bi nîqaşên J.C.R. Licklider ve hîmên wê hat avêtin. Licklider diyar kir ku kesê/a ku bixwaze di pergalek têkel a gerdûnî de, bi vî pergale ra bikaribe were girêdan û ji her deverê ve bikaribe xwe bigihîjîne dane û bernameyan. Xebatên ku di sala 1962an da bi projeya *DARPA- Defence Advanced Research Projects Agency* (Projeya Lêkolînê ya Parastinê ya Pêşverû)yê hat destpêkirin di sala 1965an da encamek bêhempa derxis holê ku cara yekem Lawrence Roberts û Thomas Merill di navbera du komputeran da danûstandin pêk anîn. Ev projeya DARPA ku ji aliyê Wezaretê Parastinê ve dihat birêvebirin duvre bi navê ARPANET, salek şunde li çar navendên cuda pevgerêdanên komputeran pêk anîn. Ev pevgerêdanên çar navendên li Amerîkayê bû destpêka înternetê û duvre di demek kurt de berbelav bû. Cara yekem e-mail (nameya elektronîk) di sala 1972an da di nav ARPANETê da hat bikaranîn.

¹⁸ Bnr. Salih Akin, Pêşgotina ferhenga bi sernavê Dictionnaire kurde – français (ferhenga kurdî - frensî) ya A.Jaba, 2014, weş. Avesta

¹⁹ IŞIK, 2015, r.157

Înternet, ji sala 1995an şûn da bi temamî ji destê Wezaretê Parastinê ya Amerîkayê derket û kete destê şîrketên taybet ku niha bi tevahî di destên van pargîdanîyên taybet da ye²⁰. Di roja me da li gorî Komeleya Înternetê (Internet Society) hejmara komputerên ku bi înternetê ve girêdayî ne ji 900 mîlyonê derbas dibin. Piştî kurte dîroka înternetê bi kurtasî mirov dikare bibêje ku înternet; ji bo mirovên, civatên û welatên cîhanê bi hev û din ra bide girê dan dihê bikaranîn.

Wekî li jor jî hat dîyarkirin geşbûna înternetê piştî salên 1990î pêk dihê û li çar aliyên cîhanê belav dibe. Niha hejmara bikarhênerên înternetê yê Tirkiyeyê nêzîkî 60 mîlyonê bûye ku ji aliyê *We Are Social* û *Hootsuite* ve hejmara wan 59.36 mîlyon hatîye dîyarkirin²¹. Her wiha li temamîya cîhanê ev hejmar wekî 4.38 mîlyar hatîye dayîn. Wekî ku dihê dîtîna înternet bi lez û bez li her qadên cîhanê; bêyî cudahiya ol, ziman, nijad û welatan digihîje her deverê ruyê zemînê. Ferhengnasî jî ji vê geşbûna înternetê para xwe stand û edî xebatên xwe yê li ser ferhengan di qada dijîtal da bi kar anîn. Bi pêşketinên teknolojiyê jî roj bi roj, ferhengên çapkirî bi ferhengên elektronîkî va hatin guhertin. Ferhengên elektronîk yê online jî ji bo ferhangan çavkanîyeke bêhempa ye ku maweya gihîştina daneyên ferhengî, bi lez û beztir kiriye. Di binbeşa cureyên ferhengan da li ser ferhengên online bi berfirehî hat sekinandin. Em dê niha girîngîya van ferhengên online ji bo zimanê kurdî vebêjin.

Dema daneyên ferhengî li ser înternetê bihên barkirin, ev jî rê li ber xwe gihandina girseyên mezin vedike. Ferhengên online yê di demeke kurt da gihanîya daneyan pêkan dikin, ji rojanekirina ferhengên çapkirî leztir rojanekirina wan pêk dihê. Ev rewş jî eleqeya bikaranîna van ferhengên online, mezintir dike. Ferhengnûsîya kurdî jî ku sê sed sal zêdetir bi rêya destxetan an çapê heta roja îroyin hat, niha bi rêya ferhengên online dikare xwe bigihîjîne ne tenê kurdan her devera cîhanê. Yekem ferhenga online di destpêka s.s 21an da sala 2004an dest bi weşana xwe kiriye. Ev ferhenga online ya bi zimanê kurdî, Wikîferheng e ku ji aliyê çend kesan ve xebata wê hatiye destpêkirin û niha di nav ferhengên kurdî yê online da, ya herî bi kêr hatî ye. Di mijara ferhengnasîyê da amaje pê hat kirin ku ji aliyê sazîyên navnetweyî yan herêmî ve xebatên ferhengnasîyê dihên kirin û birêvebirin. Wekî hat dîyarkirin ferhenga tirkî sala 2002an da ji aliyê TDKyê ve hat dijîtalîzekirin û li gor serdema înfomatîkê gihîşt berdestê bikarhêneran. Ji ber sedemên dîrokî saziyeke serbixwe ji bo

²⁰ Ji bo agahiyên berfireh bnr. malpera <https://www.armadigital.net/bilgi-bankasi/internetin-tarihcesi> (têketin:29.01.2020)

²¹ Ji bo agahiyên berfireh bnr. Malpera <https://dijilopedi.com/2019-turkiye-internet-kullanim-ve-sosyal-medya-istatistikleri/> (têketin: 29.01.20)

zimanê kurdî her çiqas tune be jî di nav 15 salan da çendîn ferhengên kurdî yê online hatine amadekirin. Ev xebatên ku ji bo zimanê kurdî di qada înernetê da hatine kirin em dê niha di beşa duyem da li ser wan yek bi yek rawestî û raxî berçavan.

BEŞA DUYEM

FERHENGÊN KURDÎ YÊN ONLINE

Di vê beşê da panzdeh heb ferhengên kurdî yên online yek bi yek dê bihên pêşkêşkirin. Her wiha em dê hewil bidin girîngîya ferhengên online li gor taybetîyên wan pêşniyarê bikarhênerên ferhengên bikin.

2.1. Wikîferheng

Projeya wikîferhenga kurdî, di sala 2004an da hatiye destpêkirin. Wikîferheng, mîna wikîpedîya, wikîgotin, wikîçavkanî, wikîpirtûk û hwd. projeyeke weqfa wikîmedyayê ye. Xwerû bi zimanê kurdî hatiye amade kirin ku niha em dê yek bi yek li ser taybetîyên wê rawestin. Di malpera wikîferhengê da, derbarê ferhenga kurdî da agahîyên zelal di serrûpelê da wiha hatine dayîn²²:

“Bi xêr hatî, Wikîferhengê! Wikîferheng, ferhengeke kurdî – kurdî, biyanî – kurdî ye û beşek e ji ‘Wiktionary’ya navneteweyî. Projeya wikîferhengê bi zimanê kurdî di 2ê gulanê ya 2004an da hatiye avakirin. Vê gavê hejmara rûpelên wê ji 801 hezarî derbas bûye. Wikîferheng wekî projeyeke temamker a Wikîpediyayê hatiye tesewirkirin, lê ne wekî ferhengên ku tê zanîn e. Mebesta me ne tenê wateya peyvan e, bi wateya peyvan ra rêziman, etîmolojî, şîrove, xwendin, hevwater, peyvên nêzik, notên bikaranînê û hwd. jî hebe. Gelek ji rûpelên ferhengê bi wêne hatine xemilandin da ku têgihîştin hêsantir be. Li dawîyê jî wergera peyva kurdî bi gelek zimanan tê dayîn. Ev ferheng bi kurmancî ye lê tê de peyvên bi zaravayên din jî cih digirin. Alfabeya serekî ya ferhengê kurdîya latîni ye lê kurdîya bi aramî anku erebî jî cih digire. Ji xeynî vê di her rûpelê vê ferhengê da ji qismê jor dikarî vebijêrêkên “tîpên latîni” an jî “tîpên erebî” bibijêrî. Wikîferheng wekî projeyên din ên Wikîmedyayê, “wikî”yek e. Tiştê herî balkêş ya vê ferhengê ew e ku xwendevan bi xwe (bêyî qeydbûnê) dikarin peyvan lê zêde bikin an jî guherandinan bikin.”

Di serrûpela ferhengê da navê wê ‘*Wikîferheng, ferhenga azad*’ hatiye nivîsîn û agahîya ‘*di ferhengê da niha 811.377 peyv hene*’ lê hatiye zêdekirin. (kanûna paşîn 2020) Taybetîya herî girîng ya wikîferhengê, wek hatiye dîyar kirin înteraktîfbûna wê ye, ku bi saya vê polîtakaya weşanê, heta niha hejmara peyvên ferhengê gihîştîye vê astê. Ger mirov li serrûpelê binihêre (<https://ku.wiktionary.org/wiki/>), dewlemendîyek bêhempa li çavê mirov dikeve. Lewra ji bo ev dewlemendî bihê dîtin em dê serrûpela ferhengê li gor qismên dîyarkirî

²² Bnr. Malpera <https://ku.wiktionary.org/wiki/Destp%C3%AAk>, (têketin: 23.01.2020)

yek bi yek rawestin. Ger li wêneyê jêrîn bihê nihêrtin dê bihê dîtin ku, li aliye çepê navê ferhengê hem bi tîpên latinî hem jî bi tîpên erebî hatiye nivîsîn.



Wêne 2. 1: Serrûpela Wikîferhengê da qîsmê lêgerînê

Ji bo peyvên lêgerînê jî li jora qutîya lêgerînê (search box), alfabayên latinî û erebî bi temamî hatine dayîn. Mirov li kîjan tîpê bitikîne bikarhênerên ferhengê, arasteyê peyvên bi wê tîpê di ferhengêda tomakirîne dihên. Her wiha li qorzîya jêr ya çepê (sol alt köşe) ya wêneyê, nivîsa rûpelên ‘*Peyvekê çêke, Rûpela ketober û Hemû gotar*’ heye. Dema li bişkoka (button) *Peyvekê çêke* bihê tikandin; ji bo zimanên kurdî, elmanî, erebî, farisî, frensî, hollendî, îngîlîzî, japonî, rûsî, tirkî û zimanek din peyv dikare bihên çêkirin. Ev deh zimanên nav bihûrî, di çêkirina peyvên da yên herî li pêş in. Dema peyvekê dihê çêkirin li gor şablona dîyarkirî peyv bi hêsanî dihê çêkirin ku li jêr mînakek hat dayîn²³:



Wêne 2. 2: Rûpela peyvekê çêke ji bo zimanê elmanî û erebî

Di şablona peyvçêkirinê da ji aliye rêzîman ve peyva dihêçêkirin; li gorî *navdêr, lêker, rengdêr, hoker û biwêj* hatine dabeşkirin. Bi vî awayî peyvlêzêdekirin, ferhengê rêkûpêktir dike. Her wiha gava li bişkoka *Rûpeleke ketober* bihê tikandin, peyveke ketober (rastgele), di

²³ Bnr.

https://ku.wiktionary.org/wiki/W%C3%AEk%C3%AEferheng:Peyvek%C3%AA_%C3%A7%C3%AAke , (têketin: 23.01.2020)

rûpeleke nû de vedibe. Bi peyvên ketober; mirov dikare derheqê peyveke ku ferheng rastgele nîşanê me dide agahî bigire. Dema ez li vê rûpelê ditikînim ev peyva jêrîn dihê xuya kirin:



Wêne 2. 3: Mînaka rûpela ketober

Her cara ku li vê rûpela ketober bihê tikandin peyveke nû nîşanî me dide. Di mînaka wêne 2.3an da peyva ‘krant’ nîşanê me daye ku ev peyv, peyveke holendî ye û wateya wê ya bi zimanê kurdî jî ‘rojname’ hatiye dayîn. Gava li bişkoka Hemû gotar jî bihê tikandin, di ferhengê da çiqas peyv hebin, li gor tîpa mirov dinivîse dikare bigihîje hemû rûpelên ferhengê.

Di nîveka serrûpelê li binî qutîya lêgerînê da, her hefte di bin navê ‘Peyva hefteyê’ da peyvek bi tevî wêne dihê parvekirin. Ev parvekirin ji bo bikarhênerên ferhengê pir bi kêr dihê ku peyva vê hefteyê me li jêr nîşan da:



Wêne 2. 4: Mînaka peyva hefteyê



Wêne 2. 6: Beşa *ji gencîneya me* di Wikîferhengê da

Di binê sernavê *‘ji gencîneya me’* da peyvên ji zimanên kurdî, inglîzî, almanî, fransî, îtalî, tirkî, rusî û spanî peyvên daxwazkirî hene. Mînak, dema li *‘Peyvên îtalî yên daxwazkirî’* bihê tikandin peyvên heta niha di zimanên îtalî da ji ferhengê hatine daxwazkirin rêz bi rêz têtin. Di vê gencîneyê da 24 heb pêvek dihê dîtî ku her yek ji van birastî jî gencîneyek in. Ji van gencîneyan çend mînak: Peyvên kurdî yên kurt, gotinên pêşîyan, biwêjname, matematîk, hevuate, biyanîname, palîndromên kurdî, îzoglosên kurdî û arî, zazakî – elmanî, zazakî kurmancî û hwd. Di nav van pêvekan da mirov li ser palîndromên kurdî û îzoglosên kurdî çend tiştan bibêje dê baştir bibe.

Palîndrom; hevok, peyv û hejmarên xwendina wan ya paş û pêş ve wekhev in ra dihê gotin. Di pêvekê da palîndromên kurdî hatine nîşandan ku li jêr dihên xuyakirin.



Wêne 2. 7: *Palîndromên kurdî* di Wikîferhengê da

Di vê rûpelê da sernavê ‘çavkan’î da dihê xuyakirin ku jêgirê rûpela palîndromê Husein Muhammed e. Çend mînakên palindromên kurdî: kelek, şaş, xax, xox, ala, nan û hwd. Di mînanan da jî dihê dîtin ku xwendina van peyvên palîndrom, ji paş û pêş ve wekhev in.

Di pêveka ‘îzoglosên kurdî û arî’ da li gor herêman, dengên ku veguherîne dengê cuda li gor van hereman hatine dayîn. Mînak dengê ‘d’ya kurmancî li deverên zazakî veguheztîye dengê ‘v’yê ku di peyva deng – veng da bi rihetî dihê dîtin. Guherîna van dengan li gor herêman di zimannasîyê da wek îzoglos dihê pênase kirin. Wîkîferheng jî ev îzoglosên kurdî wek gencîneyek di pêvekekê da raxistiye ber xwendevanan ku ji bo xebatên li ser zimên, mirov ra dikarin bibin alîkarîyek bêhempa. Li jêr mînakeke îzoglosên kurdî me da xuyakirin ku di wêneyê da dihê dîtin, li gor herêman zazakî, beluçkî, kurmancî, farsî û hwd. peyva ‘jin’ guherînên çewa derbas kiriye dihê xuyakirin.

*ç, *ç [biguherîne]												
Hind-Ewropa	Ewistki	Partki	Goranki	Azarki	Zazaki	Talişki	Semnanki	Sengiserki	Mazenderanki	Beluçki	Kurmancî	Farski
*g(u)(h)pal	j	ž	ž	ž (y-)	j	ž	j, ž	j, ž	j, (z-)	j	ž	z
*gwen-	ceñi-	jena	jeni		ceñi	jen	ceñiya	jen	zena	cen	jin	zen
	cen-				cin-			jen-			jen-	zen-
*gwei-	civ-		jiway		ciwiyayış	jiye				ciag	jiyan	zisten
*gwei-	civ-				cinde			zende	zendu		zindi	zende
					cor			jar			jor	zeber
			çir		cêr		jir	jir		çêr	jêr	zir
		ej			ci				je		ji	az
*k(u)pal	j	-ž-	-ž-	-ž-	-j-	-ž-	j, ž	j, ž	-j-	-j-	-ž-	-z-
*leuk	reoc-		roç		roc			ruj	reoz	roç	roj	ruz
*wek-	vac	vaj	waç		vac			vawj			bêj	avaz
	arecah	erjan			ercan			erzun	erzun		erzan	arzan
			wiç-		vic-			vij-			bêz-	biz-
*pekw-	pec-				pewc-			pêj-			pêj-	pez-
	-cît	-ij			zi						ji	

• Zazaki zi Farskiyê Miyanêni ra girewto

Wêne 2. 8: Rûpela îzoglosên kurdî û arî di Wîkîferhengê da

Rûpela îzoglosên kurdî û arî da, deh heb (ji bo rêbendana 2020an) îzoglosên kurdî hatine nivîsîn ku me yek li jor nîşan da. Ji bo vê rûpela îzoglosê di dawîya rûpelêda hin çavkanî jî hatine dayîn ku ew çavkanî ev in:

- Zülfü Selcan, Grammatik der Zaza-Sprache
- Paul Horn, Grundriss der persischen Etymologie
- [Ludwig Paul: The position of Zazaki among the westiranian languages](#)
- <http://www.etymonline.com/index.php>
- <http://en.wiktionary.org/wiki>

- <http://www.ferheng.org>
- <http://www.ijunoon.com/balochidic/mean.asp>
- <http://www.nisanyansozluk.com>

Li ser hemû gencîneyên di Wikîferhengê da, em dê nikaribin rawestin lê ji van gencîneyan em dê behsa du hebê din jî bikin ku mijara gencîneyê biqedînin. Dema di gencîneyê da li ‘*Wikîferheng: Fonetîka kurdî*’ bihê tikandin di sernavê Fonolîjîya dîrokî da 23 heb dengên li gor zaravayên kurdî di tabloyan da hatine nivîsîn, dihên dîtin û ev jî gencîneyeke zimanê kurdî ye.

Fonolojiya dîrokî <small>(biguherîne)</small>													
Pir. *ç <small>(biguherîne)</small>													
PIE	Farsiya kevin	Pehlewî	Farsî	Evista	Partî	Kurmancî	Soranî	Kelhurî	Lekî	Zazakî	Goranî	Kurdiya berz	Wate
k	č	z	z	č	ž	ž	ž	ž	ž	č, ž, z	č, j	ž	
*sek ^[1]	hačā	az	az	hačā	až	ji	-	-	ej	ci (pronoun) ^[c 1]	ce ^[a 1]	ij	from
*k ^[2] e	-ča	az	az	-ča	-ž	ji	š ^[9 1] (< *j)	š (< *j)	š (< *j), j	j ^[c 2] , z ^[c 3]	č ^[a 2]	ij	also
*pek ^[3]	*pač-	puxtān [pax-]	puxtān [pax-]	pač-	*puxtān [paž-]	pehtin [pêj-]	pêjan, pêjtin [pêj-]	?	?	pewtene ^[c 4] [pewc-, pewj-, pewz-]	petey [pêç-]	petin [pêj-]	to cook
*ewkes	raučāh	rōz	rūz	raōčāh	rōž	roj	roj ^[9 2]	rūj ^[1 1]	rūj	roce ^[c 5] , roje ^[c 6] , roze ^[c 7]	ro ^[a 3]	roj	day
*kewk-		sōxtān [sōz-]	sūxtān [sūz-]	saōč-		šewitandin [šewitin-], sotin [soj-]	sūtandin [sūtēn-] ^[9 3]			sotene ^[c 8] [socn-, sojn-, sozn-]	sotey [soç-] ^[a 4]	sotin [soj-]	burn
*wek ^[4]	-	-	-	vač-	vāxtān [vāž-]	bêj-	-	wetin ^[1 2] [wîš- < *wîj]	?	vātene ^[c 9] [va(c)-, va(j)-, va(z)-]	watey [waç-] ^[a 5]	wetin [vej-]	to say
*weik-	*vaič-	vēxtān [vêz-]	bīxtān [bīz-]	*vač-	*vāxtān [vāž-]	bētin [bêj-]	bējan [bêje-] ^[9 4]	wējjan ^[1 3] [wêj-]	wētīn [wêj-]	wītene [wīcn-, wījn-, wīzn-]	wētēy [wêç-] ^[a 6]	wētīn [wêj-]	to sift

Wêne 2. 9: Fonetîka kurdî di Wikîferhengê da

Di mînaka *fonolojîya dîrokî* da dengê ‘c’ bi kurmancî, soranî, kelhurî, lekî, zazakî, goranî, farsîya kevin û hwd. peyv tevî wateya xwe di tabloyê da hatine nîşandan. Derbarê çavkanîya vê rûpelê da jî di dawîya rûpelê da agahî hatine dayîn. Çavkanîyên ku hatine dayîn ev in:

- David Neil MacKenzie, *The dialect of Awroman (Hawraman i Luhon) Grammatical sketch, texts, and vocabulary*, 1966, Kommissioaner: Munksgaard (København).
- Ludwig Paul, *The Position of Zazaki among West Iranian Languages*, 1995, Wiesbaden.
- Gruba Xebate ya Vateyî, *Ferhengê Kirmanckî (Zazakî)-Tirkî*, Weşanxaneyê Vateyî, İstanbul 2009.
- Rosan Hayig & Brigitte Werner, *Zazaca-Türkçe Sözlük*, Tij Yayıncılık, İstanbul, 2012.
- Koyo Berz, *Qesebendê Zazaki - Tirkî Zazaca - Türkçe Sözlük*, 2004.
- W. M. Thackston: <http://fas.harvard.edu/~iranian/Sorani/> - Sorani Kurdish. Iranian Studies at Harvard University, 2006a.
- Michael Goddard: *English - Kurdish, Kurdish-English Sorani Dictionary*. Simon Wallenberg Press, 2007.

Herî dawî ji gencîneya wikîferhengê em dê behsa *Firrindenameyê* bikin. Di gencîneyê da di rêza yekemîn da bi navê *firrindenameyê* rûpelek heye ku dema em lê bitikînin di serî da ev agahî hatiye dayîn:

“Balinde, çivîk, çûk an teyr li gelek cinsên cuda cuda tên parvekirin. Di salên 1964-65an de çûknasê (ornîtolog) elmanî yê bi navê H. Kumerloeve li herêmên Wan û Hekariyê (Bakurê Kurdistanê) 219 cure komar kirin. Eve çend ji balindeyên Kurdistanê ne:”

Di naveroka rûpela firrindenameyê da di bin sernavên *Balindeyên qazan* (*Anseriformes*), *Balindeyên mirîşkan* (*Galliformes*), *Balindeyên keraviyan* (*Pelicaniformes*) û hwd. bi giştî 21 beşan da balinde li gor cureyan danasîna wan hatine kirin.

<p>Famîleya vîzvîzik an ebabilan (<i>Apodidae</i>) [biguherîne]</p> <ul style="list-style-type: none"> • Vîzvîzik, vîzvîjik, çûçika tûtelanî an pîstenga sîngspî (<i>Apus</i>) • Çevrîk, çivîrîk, ebabilîk, çewrûke [Not 1], teyrenebabilî [Not 1], çewroke [Not 1] (<i>Apus apus</i>) • Çevrîka çiyayî, çevrîka navçiya, çewrokekey alpî [Not 1] (<i>Apus melba</i>) • Çevrîka biçûk, çevrîka bînpîştspî [Sah.], çewrokekey biçûk [Not 1] (<i>Apus affinis</i>) 	
<p>Balindeyên masîgir, şalûl, qelaşînk û diksilêmanan (<i>Coraciiformes</i>) [biguherîne]</p>	
<p>Famîleya masîxwerên <i>Alcedinidae</i> [biguherîne]</p> <ul style="list-style-type: none"> • Masîxwerê koçocê kesik, masîxwer, masîgir, quileşîne [Not 1] (<i>Alcedo atthis</i>) 	
<p>Famîleya masîxwerên <i>Halcyonidae</i> [biguherîne]</p> <ul style="list-style-type: none"> • Masîxwerê sîngspî, masîgir, quileşîney sîngspî [Not 1] (<i>Halcyon smyrnensis</i>) • Masîxwerê belek, quileşîney belek [Not 1] (<i>Ceryle rudis</i>) 	
<p>Famîleya şalûlan (<i>Meropidae</i>) [biguherîne]</p> <ul style="list-style-type: none"> • Şalûl, şehîlûr, kulkulî, mîşxwelînk, mîşgîrk, mîşxurîk, mîşxur, kendesme [Not 1], hengxore [Not 1] (<i>Merops apiaster</i>) • Mîşxwelînkê kesikê berçelsor (<i>Merops superciliosus</i>) 	
<p>Famîleya qelaşînk (<i>Coraciidae</i>) [biguherîne]</p> <ul style="list-style-type: none"> • Qelaşînk, qelaşînk [Farq.], bûkcuhlî, şîngînk, kerê keraco, qerejok, kerhajo, keraco, qirhajo (qirhajo), kaselleşînkê [Not 1], xumeşînkê [Not 1] (<i>Coracias garrulus</i>) 	
<p>Famîleya diksilêmanan (<i>Upupidae</i>) [biguherîne]</p> <ul style="list-style-type: none"> • Silêmanê dunikul, çûka dumdum, dawudê dunikul, diksilêman, hûhûpîk an teyrîkê dunikul (<i>Upupa</i>) 	


Wêne 2. 10: *Firrindename* di wîkîferhengê da

Navên gelek teyr û çûkên bi zimanê kurdî di firrindenameyê da dihê dîtin. Wek hemû rûpelên wîkîferhengê, di vê rûpelê da jî derbarê çavkaniyên rûpelê da agahî hatîye dayîn. Çavkaniyên ji bo firrindenameyê hatine dayîn ev in:

- [Ehmed Behrî](#) (2001). Ferhengî balinde. [Aras](#), Hewlêr.
- [Zana Farqînî](#). Ferhenga kurdî-tirkî. Enstîtuya Kurdî, Stenbol
- Zana Farqînî. Türkçe-Kürtçe Sözlük. Enstîtuya Kurdî, Stenbol.
- [Îzolî](#). Ferhenga kurdî-tirkî-kurdî.
- H. Kumerloeve (1969). Zur Avifauna des Van Gölü- und Hakkâri-Gebietes (E/SE-Kleinasien), *Revue de la Faculté des Sciences de l'Université d'Istanbul*, Série B, Tome XXXIV, Fasc. 3-4.
- R.F. Porter, S. Christensen, P. Schiermacker-Hansen (1996). Field Guide to the birds of the Middle East. T & A D Poyser, London.
- [Îsmail Taha Şahîn](#) (2006). Balindeyên Kurdistanê, 1-4. [Spîrêz](#), Duhok.
- Dr. [Mehmed Teqî Îbrahîmpûr](#) (1373). Wajename-ye Kordî-Farsî. Qeqnûs, Taran.
- [Taufiq Wahby & C.J. Edmonds](#) (1966/1996). A Kurdish-English Dictionary. Oxford University Press, Oxford.

Di serrûpela wîkîferhengê da ferhenga soranî – kurmancî hêjayî gotinê ye ku, em dê niha derbarê vê ferhengê da çend agahî bidin. Li aliyê rastê yê serrûpelê di binê nivîsa ‘Di

derbarê me de' da beşa Pirzimanî heye. Di binê vê beşê da ferhenga *Soranî – Kurmancî* xuya dike ku me li jêrê nîşan daye.



Wêne 2. 11: Di Wikîferhengê da ferhenga soranî – kurmancî

Di sernavê ‘*Soranî – Kurmancî*’ da alfabeya latinî bi tîpên gir û hûr hatiye rêz kirin. Her tîpek dema dihê tikandin diçe rûpela amadekirî û peyvên soranî yê bi wê tîpê dest pê dikin, tevî tîpên erebî û latinî bi wateya kurmancîya wan ve di tabloyekî da dihên nîşandan.

Amadekar: Husein Muhammed			Aa · Bb · Cc · Çç · Dd · Ee · Êê · Ff · Gg · Hh · Ii · Îî · Jj · Kk · Ll · Mm · Nn · Oo · Pp · Qq · Rr · Ss · Şş · Tt · Uu · Ûû · Vv · Ww · Xx · Yy · Zz	Çavkanî
E e [biguherine]				
Soranî	سۆرانى	Kurmancî		
e	ه	e: <i>Ew kurd e</i> Ew kurd e		
e-	ه-	di-: <i>ekat dike, edim didim, egiryan digirin</i>		
-e	-ه	-o; -ê (paşpirtika vokativî yekhejmar): <i>kurre kuro, mame mamo, apo, kake keko, bawke babo, bavo, kere kero; dayîke dayê, xwişkê, kêçe keçê</i>		
ebê	ئەبێ	1. dibê, dibit, dibît 2. divê, divêt		
ebleq	ئەبلەق	matmayî, ecêbgirtî, mestbûyî		
ebyall	ئەبیال	betenî		
ebreş	ئەبرەش	(anatomî) zirav		
ecinda	ئەچندا	rojêv, ajenda		

Wêne 2. 12: Mînaka ferhenga soranî – kurmancî

Wek di wêne 2.12 da jî dihê dîtin li tîpa ‘*Ee*’yê hatiye tikandin û di encamê da peyvên soranî yên bi tîpa *e*’yê dest pê dikin wateya wan a kurmanacî hatiye nivîsandin. Amadekarê rûpelê wekî di wêneyê da jî dihê xuya kirin Husein Muhammed e. Li milê rastê li qorzîya jor dema peyva **Çavkanî** bihê tikandin dê çavkanîyên ferhengê vebibin. Çavkanîyên vê rûpela ferhengê di malperê da wiha hatine nivîsîn:

Çavkanîyên *Ferhenga soranî - kurmancî* ya Husein Muhammed

- Abbas, Lokman: Ferhengî kurdî-finlendî (soranî), Kurdi-suomi sanakirja (soranî), Hanko - Fînlenda, 1997.
- Abdullah, S. and Alam, K., English-Kurdish (Sorani) and Kurdish (Sorani)-English Dictionary. Hindistan 2004.

- Hejar: Henbaneborîne. Kurdî-kurdî-farisî. Sîrûş, Tehran, 1991.
- Mukriyanî, Gîwî: Ferhengî Kurdistan. Amed 2006.
- Qezaz, Şefîq: Ferhengî Şarezûr Kurdî-îngilîzî, Shafiq Qazzaz, The Sharezoor Kurdish-English dictionary. Hewlêr 2000.
- Raman: English-Kurdish (Sorani) Dictionary, Bîtanya 2003.
- Wahby, Taufiq û C.J. Edmonds: Kurdish-English Dictionary London 1966.
- Xal, Şêx Mihemed: Ferhengî Xal, Silêmanî (3 beş: 1960, 1964, 1976)

Di binî ferhenga soranî – kurmançî da sernavê ‘*Alîkarî*’ heye ku li jêr dihê xuyakirin:




Wêne 2. 13: Di Wikîferhengê da *alîkarî*

Di beşa *Alîkarîyê* da heft sernav hene ku ya ewil ‘*wikîferheng zibare ye*’ ye. Dema li vê nivîsê bihê tikandin ji bo vexwendina wikîferhengê derbarê formata nivîsê, rûpel çêkirin û guherandinê û hwd. da agahî hatine dayîn. Ji zibareyê qest ev e ku di rûpelê da ev agahî hatine dayîn:

“**Zibare**, karek e ku gelek kes bi hev re dikin daku bigihîh armanceke hevpar. Wikîferheng (wiktionary) jî zibare ye anku projeyek hevbeş û azad e. Her kes dikare rûpelên nû lê zêde bike û yên heyî baştir bike. Bikarînerên vê ferhengê jî wek te evîndarên ziman û çanda kurdî ne. Kes ji wan ne ti qezencek diravî werdigire û ne jî ji bo armancên nediyar dixebite. Tek armanca van ferhegnvanan xizmeta zimanê me yê şîrîn e. Em her kesî vedixwînin dewlemendkirina vê rûpelê. Bo destpêkirinê, kerem bike van beşan bixwîne: *formata nivîsê, rûpelên nû çêke, rûpelên heyî biguherîne, peyvekê bixwaze, van rûpelan çêke û rûpelên xwe*”

Ji bo danasîna serrûpela ferhengê em biqedinin dê li dawîya wê jî binihêrin. Li herî jêra serrûpelê ev wêneyê jêrîn dihê xuyakirin:



Wêne 2. 14: Di dawîya serrûpela da *Malbata Wikîmediyayê*

Li dawîya serrûpelê di binê sernava *Malbata Wikîmediya* da Wikîgotin (Gotinên kesan), Wikîcure (Rêbernameya cureyan), Wikîpirtuk (Pirtûk ji bo zanîne), Wikîversîte (Platforma zanîne), Wikîçavkanî (Çavkanîya azad) û hwd. hatine dayîn. Mirov dikare ji *Malbata Wikîmediyayê*, xwe bigihijîne van malperên ku bi zimanê kurdî di şeş kategorîyan da hatine rêz kirin. Her yek bi tena serê xwe mijarek e ku em nikarin li ser hemûyan yek bi yek rawestin. Lê ji bo dewlemendîya vê malbatê bihê dîtin em dê derheqê malpera *Wikîpirtûk (Pirtûk ji bo zanîne)* ku di navnîşana <https://ku.wikibooks.org/wiki/Destp%C3%AAK> da berdest e çend gotin bibêjin. Dema ev malper bihê vekirin ev nivîs pêşwazîya mirov dike: “*Tu bi xêr hatî Wikîpirtûkê! Di Wikîpirtûkê da niha 45 pirtûk hene. Armanca Wikîpirtûkê ew e ku pirtûkan û belgeyan sererast bike û belaş pêşkêş bike. Tu jî dikarî alîkarîya me bikî!*”

Pirtûkên di malperê da hene bi sernevên *wêje, ziman, perwerde, çîrok û helbest* hatine kom kirin. Di binê sernavê perwerde da ‘*dersên PHP’ê*’ dihên dîtin ku ev ji bo komputergerîyê dersên bikêrhatî ne. Di binê sernavên *wêje, ziman û hwd.* da jî pirtûkên bikêrhatî hatine dayîn ku ev malper wek pirtûkxaneyekê tevdigere.

Di wêne 2.14an da dihê dîtin ku li jêra serrûpelê wiha hatiye nivîsîn: “*Ev rûpel cara dawî 24 îlon 2019, saet li 17:23an de hatiye guherandin.*” Wikîferheng ji bo her rûpelekê ev agahî dide ku ev nîşanê me dide ku kîjan rûpel herî dawî kengî hatiye guncawkirin.


Di heman wêneyê da li rû nivîsa *Malbata Wikîpediyayê* nivîsa ‘*Wikîferhengên din*’ dihê dîtin û dema mirov li wê bişkokê bitikîne ev agahî xuya dike:



Wêne 2. 15: Serrûpelê malperê da Wikîfihengên din

Li vir mirov dibîne ku ji xeynî zimanê kurdî di nav zimanên cihanê da kîjan wîkîfihengên din hene. Bo mînak wîkîfihengên zimanên îngilîzî, frensî, polonî, rûsî, îtalî û hwd. li gor rêzkirina mezinahîyê ve hatine dayîn. Di nav zimanên pêleya yekemîn da ku peyvên wan ji milyonekî zêdetir in dixuyên û ew jî çar zimanên îngilîzî, frensî, malagasî û rûsî ne. Zimanê kurdî jî di nav zimanên pêleya duyemîn de ye ku di van ferhengan da hejmara peyvên ji pêncsed hezarî buhurîne. Hêjayî gotinê ye ku li gor van daneyan zimanê kurdî, di nav zimanên cihanê da di rêza nehemîn (kanûna paşîn 2020) da ye ku ev pêleyekî kêr nîne.

Di serrûpelê da herî dawî em dê behsa sernava ‘Zimanê kurdî’ bikin ku derbasî mijara danegeha Wîkîfihengê bibin. Ev sernavê ‘Zimanê kurdî, di wêne 2.15an da li rû nivîsa Wikîfihengên din dihê dîtin û dema em li vê bişkokê bitikînen ev agahî der dihê pêşberî me:



Wêne 2. 16: Serrûpelê da Zimanê kurdî

Di binê sernavê Zimanê kurdî da derbarê zimanê kurdî de agahiyên berfireh bi zelalî hatine dayîn. Di serî da behsa malbata zimanê kurdî, zaravayên wê û deverên li cihanê ev ziman dihê axaftin hatine kirin ku tevî li ser nexşeyekê nîşanê me dide. Dema em li nivîsa

(dûmahîk...) bitikînin hîn zêdetir behsa zimên hatiye kirin û di bin neh sernavan da hatine kom kirin. Deh sernavên diyarkirî ev in:

- Zimanê kurdî (kurmancî, soranî, zazakî, goranî, kirmanşanî, devokên zaravayên kurdî)
- Dabeşandina zimanê kurdî
- Alfabeyên kurdî
- Rêzimana kurdî
- Rewşa zimanê kurdî
- Bide ber
- Binêre
- Çavkanî
- Girêdanên derve

Di vê rûpelê da ji bo danasîna zimanê kurdî hem navên xwemalî yên wek kurmanciya jorîn, behdînanî û hwd. hem jî rewşa fermî ya zimên di tabloyekê da tevî hejmara axêverên wê hafîne dayîn. Çavkanîyên rûpelê hatine dest nîşan kirin û guncawkirina vê rûpelê li gorî agahiya hatiye dayîn: *'cara dawî 21 kanûna paşîn 2020, saet 15:25an de'* hatiye kirin. Ev dîrok nîşanê me dide ku agahîyên zimanê kurdî demek nêzde lê hatine zêdekirin. Divê bihê gotin ku di nav ferhengên online da tenê di Wikîferhengê da ji bo danasîna zimanê kurdî agahî hatine dayîn û ev girîngîya wê dest nîşan dike. Em dê bibînin ku ferhengin kurdî yên online yên din da derheqê zimanê kurdî da tu nivîs nehatine nivîsîn.

Karê di wikîferhengê da dihê kirin bi hewldan û cehidandina çend kesan ve dihê kirin. Kesên ku bi awayekî aktîf tê da kar dikin, bi giştî derdora deh kesan in. Lê berhem û karê ku beramberî vê pêk hatiye tiştêkî bêhempa ye. Divê em behsa hejmara peyvên ferhengên kurdî yên di danegehê da jî bikin ku ev wekî statîk di malperê da dihê ditîn.

Ziman	Hejmara peyvan
Kurdî	382.554 (hemû) 238.697 (bê tewandî)
Inglîzî	133.753
Tirkî	68.682
Erebî	39.744
Elmanî	40.334
Farisî	20.219
Latînî	7.918
Soranî	4.337
Zazakî	3.291
Frensî	1.841
Fînî	10.271
Holendî	930
Rusî	681
Koreyî	631
Swêdî	546
Îtalî	513
Japonî	504
Çînî	355
Yewnani	350
Romanî	321
Ermenî	193
Kurdiya başûrî	59

Amar / statîstîk	
Jimara rûpelan	825.427
Jimara nivîsaran	811.437
Jimara dosyeyan	15
Jimara guherandinan	3.846.158
Jimara lênerînan	
Jimara bikarîneran	7357
Jimara bikarînerên çalak	64
Jimara koman:bot	21
Jimara koman:rêveber	5
Jimara koman:burokrat	0

Wêne 2. 17: Hejmara peyvan û amarên di Wikîferhengê da

Hejmara peyvên kurdî di ferhengên kurdî, îngîlîzî, tirkî, erebî û hwd. da bi temamî 21 ferhengan hatine dayîn. Her wekî din di tabloya ‘Amar / statîstîk’ da jimara rûpelan, nivîsaran, dosyeyan, guherandinan, bikarîneran û bikarnerên çalak dihên xuyakirin.

Bi çend zimanhezên kurd, ferhengek kurdî – kurdî – biyanî ya elektronîkî derketiye holê ku me taybetiyên wê li jor raxist ber çavan. Niha hejmara rûpelên wê ji 811.437î derbas bûye. Ev ferheng, ku bi navê Wikîferheng dihê nasîn, projeyek navneteweyî û bi hemû zimanên dinyayê ye. wekî me di serî da jî behskir di ferhenga kurdî da her peyva kurdî bi kurdî dihê ravekirin. Her wiha etîmolojî û peyvên têkildar û yên ji wê peyvê hatine çêkirin jî di heman demê da dihên dîyarkirin. Gelek rûpelên ferhengê bi wêne û nimûneyan hatine xemilandin da ku têgihîştin hêsantir bibe. Dûvre wergera peyva kurdî bi gelek zimanan dihê dayîn. Ferheng bi kurmançî ye lê tê da peyvên zaravayên din jî cih digirin. Alfabeya serekî ya ferhengê kurdîya latînî be jî kurdîya bi alfabeya erebî jî tê da cih digire. Ferhengek înteraktîf e ku herkes dikare peyvan lê zêde bike û her roj bi dehan rûpelên nû li ferhengê zêde dibin.

2.2. The Kurdish Dictionary

Ferhenga online ya The Kurdish Dictionary, peyvan di navbera du zaravayên kurdî yê kurmançî û soranî da werdigerîne. Her wiha peyvan di navbera zimanê kurdî û îngîlîzî, erebî, tirkî, farisî, swêdî û spanî da werdigerîne. Bi vî awayî ev ferhenga online ji xeynî di navbera peyvên zaravayên soranî û kurmançî da, di şeş zimanan da jî dikare wergerê bike.


Ferhengeke wek du zimanî tevdigere ku bi zimanên kurdî-îngîlîzî, îngîlîzî-kurdî; kurdî-erebî, erebî-kurdî; kurdî-farisî, farisî-kurdî; kurdî-tirkî, tirkî-kurdî; kurdî-swêdî, swêdî-kurdî; kurdî-spanî, spanî-kurdî deh ferheng di malperê da dihê dîtin. Ger ferhengên kurmancî-soranî û soranî-kurmancî jî bihê hesabkirin ferhenga online ya The Kurdish Dictionary bi temamî diwanzdeh ferheng di xwe da dihewîne. Di malperê da derbarê avakirina ferhengê da bi zimanê îngîlîzî ev agahî hatiye dayîn:

“The early beta version was launched in March of 2016, and later on in November 2017, we launched the 1.0 version of the dictionary.”

Li gor agahîya jorîn, xebata destpêkê ya ferhenga The Kurdish Dictionary di adara 2016an da hatiye weşandin û mijdara 2017an da jî xebata version 1.0 dest pê kiriye. Ev version 1.0 nîşaneyeke ku di demên pêş da ev xebata ferhengê dê berfirehtir bihê kirin. Piraniya danegeha (database) The Kurdish Dictionary ji Lexin pêk dihê. Ev Lexin rêzek ferhengek e ku di navbera zimanên swêdî û popoler da ji aliyê penaberan ve dihê bi kar anîn.

Wergerên bi zaravayê soranî ji aliyê wergêrê Rebwar Rashed Davodî ve hatiye amade kirin. Ji bo wergerên kurmancî jî Mahmut Lewendî, Mustafa Aydogan û Vîldan Tanrikulu beşdarî karê wergerandinê bûne. Di malperê da hatiye ragihandin ku bêyî alîkarîya van kesên navên wan bihurî, ev xizmeta ferhengê dê pêk nehata.

Dema navnîşana ferhengê ya <https://www.thekurdishdictionary.com/en> bihê tikandin ev dûmena jêrîn dê bihê xuya kirin:




The screenshot shows the top section of the 'The Kurdish Dictionary' website. At the top left, the title 'The Kurdish Dictionary' is displayed. On the top right, there is a 'LOG IN' link and a menu icon. Below the header, there are two language selection sections. The first section, labeled 'from', has buttons for 'Sorani', 'Kurmanci', 'English', and 'Turkish'. The second section, labeled 'to', has buttons for 'Sorani', 'Kurmanci', 'English', and 'More'. At the bottom of this section, there is a search bar with the placeholder text 'Enter your word' and a red 'Search' button.

Wêne 2. 1: Serrûpela ferhenga The Kurdish Dictionary

Wek di dûmenê da jî dihê dîtin dema mirov bixwaze wateya peyvekî binihêre ji zimanê ‘from’ (ji) ber bi zimanê ‘to’ (bo) ve werdigerîne. Dema li ser qutîya lêgerînê peyvek hat nivîsandin li bişkoka sor ya ‘search’ (bigere) dihê tikandin an ji klavyeyê li bişkoka enterê

bihê tikandin encama lêgerînê der tê pêşberî mirov. Di vê ferhengê da mînak jî dihêne dayîn. Mînakek ji encama lêgerînê li jêr dikare bihê dîtin:



Wêne 2. 2: Mînaka lêgerîna peyva ‘çav’

Wekî di serî da jî hat gotin ev ferheng di navbera du zaravayên kurdî (soranî û kurmancî) û îngilîzî, erebî, tirk, farisî, swêdî û spanî da wergerê dike. Ji ber ku di danegha ferhengê da çiqas bêje hene nehatîye dîyar kirin derbarê mezinahîya ferhengê da niha agahî li ber destê me tune ye. Ji bo polîtîkayên weşandina ferhengê jî agahîyek nehat bidestxistin. Lê dema di sala 2017an da xebata ferhengê bi ‘version 1.0’ hatiye binavkirin, ev nîşanayek e ji bo berdewamîya polîtîkaya weşandinê.

Ev ferheng ji aliyê berfirehkirina bêjeyên ferhengê da vekirî nîne ango ferhengeke înteraktîf nîn e. Ev jî dihê wateya ku her kes nikare vê ferhengê sererast bike an jî peyvên ku tê da tune bin tevî vê ferhengê bike. Di medyaya civakî da li ser facebook û twitter jî hesabên ferhenga The Kurdish Dictionary hene ku wateya peyvan li ser wêneyan digihijîne bikarhinerên xwe. Li ser wêneyan peyvên îngilîzî bi zaravayên kurmancî û soranî hatine nivîsîn. Lê her çiqas di malperê da têketin (login) xuya bike jî mirov nikare bibe endamê malperê da ku bikaribe agahîyên berfirehtir dest bixe.

2.3. MyMemory Translated


MyMemory, wergera herî mezin a cîhanê ye. Ew ji bo berhevkirina belgeyên wergera Yekîtiya Ewropî û Neteweyên Yekbûyî û belegeyên hwd. hatine çêkirin. Her wiha ji bo hevgerîna malperên pirzimanî hatiye amadekirin.

Ev malpera MyMemory Translated ji sala 2008an vir ve di qada zekaya sînî (yapay zeka) û di mijara şixulîna zimanên xwezayî (doğal dil işleme) da rolek çalak dilîze. Bi zanîngehên herî baş û navendên lêkolînê ra dixebitin ku bi piştgirîya van zanîngehan ra gelek gotarên zanistî bi hev ra nivîsandine. Di projeyên lêkolînan da ji bo wergerên profesyonel yê dokumentan MateCat û ModernMT bi kar tînin. ModernMT, yekem teknolojiya wergerandinê ya makîneyê ye ku bi taybetî ji bo wergêrên profesyonel hatiye çêkirin. MateCat jî amûrek wergerbar a komputer-arîkar e ku bîranînên wergera hevkar, kontrolên kalîteya zimanî û wergerandina makîneya adaptasyona noralî (nöral uyarlanabilir makine çevirisi) tevî hev dike.

Navenda vê şirketê li Kalifornîyayê ye. Ofiseke wan jî li Îtalyayê li bajarê Romayê ye ku wergerandina belgeyan di 176 zimanan da dikarin bikin. Di karê wergerandina belgeyên van zimanan da ji sala 1999an vir ve çalak in. MyMemory Translated di sala 1999an de ji hêla zimanzanek û endezyarek komputerê ve hatiye destpêkirin ku vîzyona xwe li ser hevoka *‘pêdivî ye ku ziman, ji bo mirovan bibe fersend nebe asteng’* li dar xistine. Danasîna malperê da hatiye gotin; bi wergêrên pispor ra û bi saya zekeya sînî (yapay zeka) li ser mîsyonekî wiha ne ku *‘zimanên cîhanê ji cîhanê ra vekin.’* tê gotin. Ji bo danasîna MyMemory, taybetîyên wê hemû em nikarin li vir bidin lê bi taybetî mirov dikare girîngîya wê di van hevokên jêrîn da bibîne ku ew bi xwe ev agahî dane:

“Standardên ku bi tevahî ji 25 mîlyon peyvan pêk dihê; belgeyên siyasetê; raporên saziyên din ên YE; belgeyên çarçoveya li ser pirsgerêkên yasayî, teknîkî, darayî, zanistî û aborî; nameyên zanistî; rûpelên malperan; daxuyaniyên çapameniyê.”

Ji bo wergerandinên zimanê kurdî, cih daye du zaravayên kurdî (kurmançî û soranî). Navnîşana malperê ya MyMemory <https://mymemory.translated.net/> e. Zimanê malperê îngîlîzî ye. Di serrûpela malperê da dema em vebijêrkên zimanî bitikînin *kurdish* û *kurdish soranî* dihê ditîn.



Wêne 3. 1: Serrûpela MyMemoryyê da zimanê kurdî

Ev ferhenga online hem peyvan hem jî hevokan werdigerine ku ev taybetîya MyMemory, wê ji ferhengên din cuda dike. Em dê bibîn ku ev taybetî tenê di Google Translated û Glosbe Translated da dihê dîtin. Ji bo wergerên metnên pîşeyî, edebî, zanistî û hwd. bikêrhatî ye. Dema wateya peyvek dihê gerandin mînakên cihên peyv tê da derbas dibin jî dide. Ferhenga onlîna ya MyMemory, ferhengeke kurdî – zimanên biyanî û zimanên biyanî– kurdî ye. Lewra ew ferhengeke pîrzimanî ye û 176 ziman di danegaha ferhengê da peyda dibin. Ji aliyê mezinahîyê ve hejmara peyvên kurdî nehatibin dîyarkirin jî dewlemendiya zimanên ferhengê ku 176 ziman in qebareya wî nîşanê me dide.

Der heqê çavkaniyên ferhengê da jî em agahdar nîn in lê ew bi wergêrên pispor ra dixebitin ku bikaribin karekî profesyonel çê bikin. Bi 205.894 wergêrên profesyonel ên pejirandî (onaylanmiş profesyonel çevirmen) û bi saya 162.272 xerîdarên xwe kare wergêrîyê ev 20 sal in dikin. Ev daneyên malperê çavkaniyên ferhengê bi awayekî nerasterat derdixe holê. Ji bo em wergerandina ferhengê, di mînakekê da bibînin li wêneyê jêrîn dikarin binihêrin:

Kurdish	English	Info
Çav	Eye	Last Update: 2011-07-05 Usage Frequency: 1 Quality: ★★★★★ Excellent Reference: Wikipedia
Çav	Eyes	Last Update: 2012-01-26 Usage Frequency: 1 Quality: ★★★★★ Excellent Reference: Wikipedia
Ji bo panela te cotek çav	A set of eyeballs for your panel	Last Update: 2014-08-20 Usage Frequency: 1 Quality: ☆☆☆☆☆ Be the first to vote Reference: Wikipedia
Çav li hêla nişaneka mişk dinihêre	The eyes look in the direction of the mouse pointer	Last Update: 2014-08-20 Usage Frequency: 1 Quality: ☆☆☆☆☆ Be the first to vote Reference: Wikipedia
Çav nikarin sepanokê bidin destpêkirin.	Can not launch the eyes applet.	Last Update: 2014-08-20 Usage Frequency: 1 Quality: ☆☆☆☆☆ Be the first to vote Reference: Wikipedia
Ger pevaxaftin ne li ber çav be hisyariyan nişande	Pop up notifications if the chat isn't focused	Last Update: 2014-08-20 Usage Frequency: 1 Quality: ☆☆☆☆☆ Be the first to vote Reference: Wikipedia
Dema pevaxaftin ne li ber çav be hisyariyan çalak bike	Enable notifications when the _chat is not focused	Last Update: 2014-08-20 Usage Frequency: 1 Quality: ☆☆☆☆☆ Be the first to vote Reference: Wikipedia
Ger pevaxaftin hê vekirî be lê ne li ber çav be jî dema peyameke nû hat standin ji bo hisyariyê wê dengê were lêdan an na.	Whether to show a popup notification when receiving a new message even if the chat is already opened, but not focused.	Last Update: 2014-08-20 Usage Frequency: 1 Quality: ☆☆☆☆☆ Be the first to vote Reference: Wikipedia

Wêne 3. 2: Encama lêgerîna peyva 'çav' di ferhenga MyMemoryyê da


Di mînaka lêgerînê da wateya peyva çav ji bo zimanê îzgilîzî hatiye wergerandin. Her wiha cihên ku peyva çav tê da derbas dibin jî tene nişandan. Li aliyê rastê yê wêneyê dihe dîtin ku mînakên wergeran kengî li ferhengê hatine bar kirin. Li gor vê mînakê jî em dikarin bibêjin di sala 2011an da di ferhenga MyMemory da zimanê kurdî cih girtîye. Lê ji kîjan salê ve dest bi wergerandina zimanê kurdî hatiye kirin em bi zelalî nizanin.

MyMemory Translated, Ferhengeke înteraktîf e. Ev jî rê li ber berfirehkirina peyvên ferhengê vedike. Her kes dikare beşdarî MyMemoryyê bibe ku bi seratkirina peyv û hevokan çêtir bike. Ferhenga online ya MyMemory, di navbera du zimanan da wergerê dike ku ji bo zimanê kurdî jî mirov dikare bibêje ferhengeke kurdî- biyanî û biyanî – kurdî ye.

2.4. Glosbe Translated

Glosbe, ferhengeke onlîna ya pîrzimanî ye. Di navbera hemû zimanan da mirov dikare wergerê bike ku tê da 2000î zêdetir ziman peyda dibin. Rûpela ji bo wergera kurdî di

navnîşana <https://ku.glosbe.com/> da ye. Li serrûpelê, ferheng bi navê ‘Glosbe – ferhenga liserxetê ya pirziman’ hatiye nivîsandin ku ji wêneyên jêrîn dikare bihê dîtin:




Wêne 4. 1: Ferhenga Glosbe ya bi zimanê kurdî

Di malperê da danasîna ferhengê bi rêkûpêk hatiye kirin ku mirov dema derheqê ferhenga zimanê kurdî – swêdî bitikîne rastî van hevokên jêrîn dihê:

“Glosbe ji bo hezaran ferhengan mahzûbaniyê dike. Em ne tenê ferhenga **Zimanê kurdî - Zimanê swêdî** pêşkêş dikin, di heman demê de em, ferhengên ji bo her cotên heyî yên zimanan liserxetê ne. Ferhengên Glosbeyê bêhempa ne. Li ser Glosbeyê tu ne bi tenê dikarî wergerên di nav **Zimanê kurdî an jî Zimanê swêdî** de venêrî: em bi nîşandana dehan mînakên hevokan ên wergerandî yên kompeyvên wergerandî dihewînin, mînakên bikaranîne jî pêşkêş dikin. Ev wekî “**bîra wergerê**” tê binavkirin û ji bo wergeran pir bikêrhatî ye. Yek ne bi tenê wergera peyvê di heman demê da tevgera di nav hevokê da jî dibîne. Bîra Wergerê ya me bi piranî bingeha hevrast ku bi tevahî bi destê mirovan hatiye çêkirin tê. Gelek berjewendiyên kêrhatî yên van hevokên wergerandî ji bo ferhengan hene.”

Ferhenga online ya Glosbe li Polonyayê cîwar e û bi zimanê polonî û îngilîzî mirov dikare bi wan ra têkilî deyne. Zimanê malperê her çiqas îngilîzî be jî dema mirov dikeve ferhenga kurdî ya vê navnîşanê <https://ku.glosbe.com/> malper bi temamî dibe kurdî. Ji bo bi giştî serrûpela ferhengê bihê dîtin me wêneyê wê li jêr bi cih kir.



Wêne 4. 2: Serrûpela ferhenga Glosbe

Di serrûpelê da sê sernavên *Çalakiyên dawîn*, *Ferhengên mezintirîn* û *Civakî* dihê dîtin. Di bin sernavê *Ferhengên mezintirîn* da hejmara mezindahîya ferhengên heyî hatine nîşandan ku mezindahîya ferhenga zimanê îngîlîzî 40.009 û ya zimanê tirkî jî 161.273 peyv dihê dîtin. Di sernavê *Çalakiyên dawî* da, kî çî wextê guherînek çêkiriye xuya dibe. Wek di wêneyê da jî xuya dibe di 21ê rêbendana 2020, saet 11:42:08 da kesek bi navê [Val Camacho](#) çalakîyek kiriye. Ferhengên bi zimanê kurdî – zimanê biyanî di bin kategoriya [Hemû Ferheng](#) da hatine rêzkirin ku me ev lîsteya ferhengan li jêrê nivîsî.

Her wiha di beşa ‘*Civakî*’ da jî mirov dikare ferhenga glosbeyê li ser hesabê facebook bişopîne. Li ser vê hesabê facebookê em agahdar dibin ku şîrketa glosbe di tebaxa 2011an da hatiye vekirin. Lê ji kengî ve bi zimanê kurdî wergerê dike bi zelalî em agahdar nebûn. Li gor lîstefa ferhengan 122 hejmar ferhengên kurdî di glosbeyê da hene ku li kîjan ferhengê bihê tikandin der barê wê ferhengê da di bin sernavên; *Bîra Wergerê*, *Jimarî* û *Tevkarî* da agahiyên zelal em dikarin bi dest bixin. Bo mînak; dema li ferhenga Zimanê kurdî – Zimanê kurdî bihê tikandin, hejmara peyvên ferhengê 211.729 dihê xuya kirin. Ev ferhengên li jêr hatine nivîsîn di glosbeyê da bi hejmarên cuda, peyv di xwe da dihewînin ku bi temamî hejmara peyvên jî deh mîlyonê zêdetir xuya dike û her kes dikare ferhengê berfirehtir jî bike.

- Zimanê kurdî - Afrikaans
- Zimanê kurdî - Anglo-Norman
- Zimanê kurdî - Armenian
- Zimanê kurdî - Asturian
- Zimanê kurdî - Bangla
- Zimanê kurdî - Bavarian
- Zimanê kurdî - Breton
- Zimanê kurdî - Burmese
- Zimanê kurdî - Chinese
- Zimanê kurdî - Crimean Turkish
- Zimanê kurdî - Esperanto
- Zimanê kurdî - Faroese
- Zimanê kurdî - Filipino
- Zimanê kurdî - Finnish
- Zimanê kurdî - German
- Zimanê kurdî - Greek
- Zimanê kurdî - Gujarati
- Zimanê kurdî - Haitian
- Zimanê kurdî - Hebrew
- Zimanê kurdî - Hiligaynon
- Zimanê kurdî - Hindi
- Zimanê kurdî - Hungarian
- Zimanê kurdî - Icelandic
- Zimanê kurdî - Ido
- Zimanê kurdî - Indonesian
- Zimanê kurdî - Interlingua
- Zimanê kurdî - Karachay-Balkar
- Zimanê kurdî - Kazakh
- Zimanê kurdî - Khasi
- Zimanê kurdî - Khmer
- Zimanê kurdî - Koyraboro Senni
- Zimanê kurdî - Lao
- Zimanê kurdî - Latvian
- Zimanê kurdî - Limburgish
- Zimanê kurdî - Low German
- Zimanê kurdî - Luxembourgish
- Zimanê kurdî - Malay
- Zimanê kurdî - Malayalam
- Zimanê kurdî - Maltese
- Zimanê kurdî - Manx
- Zimanê kurdî - Middle French (ca. 1400-1600)
- Zimanê kurdî - Min Nan Chinese
- Zimanê kurdî - Mongolian
- Zimanê kurdî - Neapolitan
- Zimanê kurdî - Northern Sami
- Zimanê kurdî - Norwegian
- Zimanê kurdî - Novial
- Zimanê kurdî - Old English
- Zimanê kurdî - Old French (842-ca. 1400)
- Zimanê kurdî - Old Norse
- Zimanê kurdî - Papiamentu
- Zimanê kurdî - Piemontese
- Zimanê kurdî - Portuguese
- Zimanê kurdî - Romansh
- Zimanê kurdî - Romany
- Zimanê kurdî - Sanskrît
- Zimanê kurdî - Scots
- Zimanê kurdî - Scottish Gaelic
- Zimanê kurdî - Serbo Croatian
- Zimanê kurdî - Sîcîlyanî
- Zimanê kurdî - Slovak
- Zimanê kurdî - South Azerbaijani
- Zimanê kurdî - Tagalog
- Zimanê kurdî - Tajik
- Zimanê kurdî - Tatar
- Zimanê kurdî - Telugu
- Zimanê kurdî - Thai
- Zimanê kurdî - Turkmen
- Zimanê kurdî - Uzbek
- Zimanê kurdî - Venetian
- Zimanê kurdî - Vietnamese
- Zimanê kurdî - Volapük
- Zimanê kurdî - Welsh
- Zimanê kurdî - Western Frisian
- Zimanê kurdî - Wymysorys
- Zimanê kurdî - Yoruba
- Zimanê kurdî - Yucateco
- Zimanê kurdî - Zimanê albanî
- Zimanê kurdî - Zimanê aragonî
- Zimanê kurdî - Zimanê azerî
- Zimanê kurdî - Zimanê baskî
- Zimanê kurdî - Zimanê belarûsî
- Zimanê kurdî - Zimanê bosnî
- Zimanê kurdî - Zimanê bulgarî
- Zimanê kurdî - Zimanê çekî
- Zimanê kurdî - Zimanê danîmarkî
- Zimanê kurdî - Zimanê erebî
- Zimanê kurdî - Zimanê estonî
- Zimanê kurdî - Zimanê farisî
- Zimanê kurdî - Zimanê fransî
- Zimanê kurdî - Zimanê galîsyayî
- Zimanê kurdî - Zimanê gurcî
- Zimanê kurdî - Zimanê holandî
- Zimanê kurdî - Zimanê îngilîzî
- Zimanê kurdî - Zimanê îrlandî
- Zimanê kurdî - Zimanê îtalî
- Zimanê kurdî - Zimanê japonî
- Zimanê kurdî - Zimanê katalonî
- Zimanê kurdî - Zimanê korêyî
- Zimanê kurdî - Zimanê kroatî
- Zimanê kurdî - Zimanê kurdî
- Zimanê kurdî - Zimanê latînî
- Zimanê kurdî - Zimanê lîtvanî
- Zimanê kurdî - Zimanê makedonî
- Zimanê kurdî - Zimanê marathî
- Zimanê kurdî - Zimanê navaho
- Zimanê kurdî - Zimanê oksitanî
- Zimanê kurdî - Zimanê polonî
- Zimanê kurdî - Zimanê rûmenî
- Zimanê kurdî - Zimanê rûsî
- Zimanê kurdî - Zimanê serbî
- Zimanê kurdî - Zimanê slovenî
- Zimanê kurdî - Zimanê spanî
- Zimanê kurdî - Zimanê swahilî
- Zimanê kurdî - Zimanê swêdî
- Zimanê kurdî - Zimanê tamîlî
- Zimanê kurdî - Zimanê tirkî
- Zimanê kurdî - Zimanê ukraynî
- Zimanê kurdî - Zimanê urdû
- Zimanê kurdî - Zimanê yîdîş
- Zimanê kurdî - Zulu
- Zimanê kurdî - Zuwanî hawayane

ferheng/Parmend

Van listeyên ferhengan di Glosbeyê da bi temamî ferhengên kurdî ne ku hejmara wan 122 e.

Di ferhenga kurdî Glosbe (ferhenga liserxetê ya pîrziman) da tenê zaravayê kurmançî heye. Ji bo wateya peyva lêgerandî mînakên cur bi cur dihê danîn ku li jêr di lêgerîna peyva ‘çav’ da ji bo zimanê tirkî encam dihên xuyakirin.



Wêne 4. 3: Encama lêgerîna peyva ‘çav’ ji bo zimanê tirkî

Wek di wêneyê da dihê dîtî ji bo lêgerîna peyva ‘çav’ ji xeynî wateya hatiye dayîn, di heman demê da 44 wateyên din jî dikarin bihên dîtî ku li ser bişkoka bi navê ‘44 pirtir’ were tikandin encamên din jî dê bihên dîtî. Her wiha cihê ku ev peyv tê da derbas dibin jî têne nîşandan.

Glosbe, ferhengeke înteraktîfe ku di listeya ferhengên li jor hat dayîn da bi sernavê *Tevkarî* da her kesî bi hevokên jêrîn vedixwîne alîkarîya ferhengê:

“Di afirandina **Zimanê kurdî – Zimanê swêdî** ferhenga herî mezin a liserxetê de alîkarîya me bike. Bi tenê têkeve û wergerên nû lê zêde bike. Glosbe projeyê hevpar e û her kes dikare wergeran lê zêde bike (û jê rake). Û tu dikarî pê bawer bî ku yek çewtîyêke di ferhengê de bi lez tê rastkirin, ji ber vê yekê tu dikarî daneya me bawer bî. Eger tu çewtîyêkê bibîn yan jî pêkan e ku daneya nû lê zêde bikî: tika ye wê bike. Bi hezaran kes dê ji ber vê spasdarên te bin. Bi lêzêdekirina wergereke nû, dehan wergerên nû tîne afirandin! Di xurtkirina ferhengên Glosbeyê de alîkarîya me bike û bibîne ku çawan zanîna te li çar aliyê cîhanê alîkarîya mirovan dike.”

Di derbarê çavkanîyên ferhengê da jî malpera glosbê agahî dide ku jêgirên sereke yê daneyan ev in:


- [Wiktionary project](#)
- [Jerzy Kajojc website](#)
- [FreeDict project](#)
- Jorg Tiedemann, *News from OPUS - A Collection of Multilingual Parallel Corpora with Tools and Interfaces* Isbn: 978 90 272 4825 1, Pages: 237-248, Pdf: [pdf](#), Publisher: John Benjamins, Amsterdam/Philadelphia, Topic: Parallel corpora, Volume: V. [OPUS](#)
- [Open Subtitles](#)
- [The DGT Multilingual Translation Memory of the Acquis Communautaire: DGT-TM](#)
- [OmegaWiki](#)
- [Tatoeba](#)

Di rûpela van çavkanîyan hatine nivîsîn da dest nîşan hatiye kirin ku: ‘*Eger tu xwedî daneya ferhengê yan jî bîra wergerê yî ku dixwazî parve bikî: bi me re têkilîyê dayne.*’ Bi vî awayî malpera Glosbe ku bi ferhenga liserxetê ya pirziman hatiye bi nav kirin hem ji aliyê mezinahîyê ve hem jî ji aliyê çavkanîyan da dewlemendîya xwe radixe ber çavan.

2.5. Google Translated

Google Translate amûrek e ku rûpelên înternetê, nivîs an belgeyên ku mirov daxistîye belaş werdigêrîne. Ew ji hêla Google ve hatiye amade kirin. Google werger, yekem car di 28ê Avrêla 2006an da ji hêla wergerandina di navbera Erebi û Îngîlîzî da ev xebat da destpêkirin. Google Translated ku bi sedî zêdetir zimanan wergerê dike li ser înternetê di karê wergerê da malpera herî çalak û bi kêrhatî ye. Di sala 2016an da zimanê kurdî jî li Google Translated hat zêdekirin. Ev xizmeta wergerê ne tenê peyvan, nivîsên dirêj (bi 5000 peyv ra sînordar e) û malperan jî dikare wergerîne bo zimanê kurdî. Di nav zaravayên zimanê kurdî da, tenê bi kurmancî niha wergerê dike.

Niha di 114 zimanan da wergerê ji bo kurdî dikare bike. Bi vî awayî ferhengeke pirzimanî ye û bi saya teknolojîya ku bikartîne, di nav ferhengên online da ji aliyê bikaranînê ve ferhengeke herî hêsan û zîrek e. Di nav ferhengê da ji bo hemû zimanan, dengên peyvên tomarkirî hene û bi saya van tomaran bidengkirina peyvên jî pêkan dibe. Lê niha ev taybetî ji bo zimanê kurdî ne derbasdar e ku wergera dihê kirin nayê guhdarkirin. Ji bo em mînaka wergerandina Googlê bibînin li jêr wêneyê wergerê hat dayîn:




Wêne 5. 1: Encama wergerandina Google Translated ji bo zimanê kurdî

Bi navnîşana <https://translate.google.com/> em dikevin serrûpela malpera Google Translated. Dema mirov bixwaze wergerê bike wekî di wênayê da jî dihê xuya kirin, li aliyê çepê peyv an metna dixwazî werbigêrî dinivîsî û piştî li jor zimanekî hildibijêrî li aliyê rastê kîjan ziman hatibe tikandin encama wergerê dide mirov.

Ji aliyê mezinahiyê ve di danegeha ferhengê da hejmara peyvên çiqas heye em nizanin. Lê ji ber ku di 114 zimanan da dikare ji bo zimanê kurdî wergerê bike, mirov ev hejmara zimanan nişaneyê mezinahîya danegehê dikare bihesibîne. Dema werger hat kirin ger mirov bixwaze wergera hatîye kirin sererast bike an der barê wî da nixandinek bike, têkiliya bi ferhengê ra pêkan e. Ev jî rê li ber berfirehkirina ferhengê vedike ku mirov dikare bibêje ferhengêke înteraktîf e.

Ji bo têkiliya ferhengê ra, li jêra wergera hatiyekirin nivîsa ‘*geri bildirim gönder*’ (paşdanezan bişîne) heye û dema mirov li vê nivîsê bitikîne, wêneya jêrîn derdikeve pêşberî me:



Wêne 5. 2: Dîmena şandina paşdanezanê

Ev mînaka şandina paşdanezanê, polîtîkaya weşanê ya Google radixe ber çavan ku her kes dikare bi rêya têkilîyê ji bo ferhengê zêedikirinek bike. Derbarê çavkanîyên ferhengê da zanîneke zelal nehat bi dest xistin. Google translated ferhengeke du zimanî ye û ji bo zimanê kurdî jî cur bi cur zimanan da wergerê dike. Ferhengên kurdî – erebî, farisî – kurdî, îtalî – kurdî an kurdî – rûsî hwd. ji van ferhengan tenê çend mînak in. Google Translated niha tenê bi zaravayê kurmancî wergerê dikare bike. Lê ji bo wergerên soranî jî xebat ji zûde ve hatiye destpêkirin ku ji aliyê Bokan Hesên²⁴ ve 100 hezar peyvên soranî ji bo Goole hatine şandin. Ger ev peyvên kurdî ji aliyê Google ve bihê pejirandin, dê Google zaravayê soranî jî li ser beşa wergerê zêde bike.

2.6. Ferhenga Enstituya kurdî ya Parîsê

Ev ferhenga online, dîyare ji aliyê enstituya kurdî ya parîsê ve hatiye çêkirin. Ferhenga online ya Enstituya Kurdî ya Parîsê, wateya peyvên kurdî bi zimanên îngîlîzî, frensî, tirkî û latinî dide. Lê tenê wateya peyvên nade, di heman demê da minakên peyvên di îdyomên kurdî da derbas dibin jî dide. Ev ferhenga online niha di navnîşana <https://www.institutkurde.org/ku/wesan/kurmanci/ferheng/> da berdest e.

Ji bo lêgerîna peyvên di ferhengêda pênc heb qutîyên lêgerînê hatine dayîn ku li jêr dihê xuyakirin.

Wêne 6. 1: Serrûpela ferhenga Enstîtuya Kurdî ya Parîsê

Di ferhengê da wateya peyvên kurdî, tenê bi zaravayê kurmancî, ji bo zimanên îngîlîzî, frensî û tirkî da dikare bihê gerandin. Di encama lêgerînê da ji bo zimanên tirkî, îngîlîzî û

²⁴ Bnr. malpera <http://candname.com/google-zaravaye-sorani-ji-li-ser-besa-wergere-zede-dike/> (têketin: 30.01.2020)

frensî mînakên, cihên ku ev peyv têda derbas dibin jî dihên nîşandan. Dema di qutîya lêgerînê ya kurdî de em peyva ‘çav’ binivîsin encamên lêgerînê wêneyên jêrîn da dê bihê dîtin.

Wêne 6. 2: Encama lêgerîna peyva ‘çav’ di ferhengê da

Derbarê çavkaniyên ferhengê û hejmara peyvên di danegeha malperê da ti agahî nehatiye dayîn. Her wiha ji bo polîtîkayên weşanê û berfirekîna bêjeyên ferhengê tiştek zelal tunebe jî mirov dikare bibêje ku ferhengeke înteraktîf nîn e. Kengî ev ferheng hatiye amade kirin jî ne dîyar e.

2.7. Ferhenga Tirşik Netê


Malpera bi navê Tirşikê bi xwe ferhengê înteraktîf e. Di malperê da jî hatiye dîyarkirin ku: ‘*ji ber ku tê da ji bo tişt, peyv, bûyer û kesan pênaseyên ferhengê hene*’ xwe wek ferheng pênase kirine. Me got ku înteraktîf e, ji ber ku herkes dikare bibe nivîskarê Tirşikê û tiştên nû li Tirşikê zêde bike. Lê malper bi xwe ne mijara me ye û em dê li ser ferhenga ku di malperê da ye bisekinin. Navnîşana malpera tirşikê <http://turkcekurtcesozluk.com/> e. Her çiqas navê navnîşanê ‘*turkce kurtce sozluk*’ be jî ev ferheng ne tenê zimanê tirkî, gelek zimanan di xwe da dihewîne ku em dê niha li ser rawestin. Berîya ku em bi berfirehî behsa ferhengê bikin ku xebatek mezin e, malûmatên der barê çêkirina ferhengê da bidin.

Tirşik Net, gulana sala 2013an da, weke xizmeta malpera wergerine.com hatiye vekirin ku ev malper dawîyê hatiye girtin. Lewra ji bo Tirşikê wisa hatiye nivîsîn: ‘heta ku em bikarin, wê tirşik ji bo xizmeta gelê kurd, amade be û wê neyê girtin.’ Di malperê da ji bo

kesek bibe nivîskar, divê ji rûpela endambûnê forma endambûnê tije bike, bişîne û bibe nivîskarê Tirşikê. Ji van nivîskarên jêhatî û dilxwaz moderator dihên hilbijartin. Lê di destpêka xebata tirşikê da hinek nivîskarên dilxwaz hebûne ku xwestine vî barî hilgirin, wek moderator hatine hilbijartin. Niha diwanzdeh moderatorên malperê hene ku navê wan wiha hatine nivîsîn: *simurg56, bruski56, azadixwaz, endezar, ceso, mergehezo, nançû, xendekî, ferhenga şikestî, berxweda û mergehez.*

Ev agahîyên malperê, di lêkolîna me da ji bo pirsê ferhengê ji aliyê kê ve û kengî hatiye amadekirin hin daneyan didin destê me. Xebata ku ji aliyê hin kesên dilxwaz ve hatiye dest pê kirin, bi diwanzdeh moderatoran ve niha dihê birêvebirin.

Ku em bihên li ser taybetîyên ferhengê ji aliyê mezinahîyê ve ji 444.724 peyvan pêk dihê. Ferhengeke du zimanî ye û 17 ferheng di xwe da dihewîne. Di serrûpela malperê da ferhengên tirkî – kurdî, kurdî – tirkî, kurmancî – kurmancî, îngîlîzî – kurmancî, kurmancî – îngîlîzî, almanî – kurmancî, kurmancî – almanî, zazakî – kurmancî, kurmancî – zazakî, soranî – kurmancî, kurmancî – soranî, koreyî – kurmancî, kurmancî – koreyî, rûsî – kurmancî, kurmancî – rûsî, esperanto – kurmancî, kurmancî – esperanto dihên dîtin:




Wêne 7. 1: Serrûpela ferhenga Tirşikê û zimanên di ferhengê da

Di ferhengê da zazakî, soranî û kurmancî sê zaravayên kurdî hene ku di navbera zaravayên kurdî da jî werger dihê kirin. Çaxa ferhengê dihê vekirin di serrûpela qutîya lêgerînê

da nivîsa ‘Hemû ziman – Tüm diller – All languages’ dihê xuyakirin. Dema wateya peyvekê di ferhengê da dihê gerandin, di nav hemû ferhengan da wateya wê dihê dîtin. Lê dema ji vebijêrkên di aliyê çepê da dihên xuya kirin zimanek bihê hilbijartin, tenê di nav wê ferhenga hilbijartî da encama lêgerînê derdikeve. Bi heft zimanên biyanî yên îngîlîzî, elmanî, koreyî, rûsî, esperanto û tirkî wergera wateya peyvên kurdî dike. Kîjan ferhengê da çiqas pev hene di îstatîstîkên ferhengê da hatine dest nîşan kirin ku li jêr me hejmara peyvên ferhengan nivîsî:

Ferheng	Hejmara peyvan
tirkî - kurdî	70576
kurdî - tirkî	159289
îngîlîzî - kurdî	15342
kurdî -îngîlîzî	8704
elmanî - kurdî	10539
kurdî - elmanî	10509
kurdî - kurdî	104349
zazakî - tirkî	2706
tirkî - zazakî	8016
zazakî - kurmancî	135
kurmancî - zazakî	46006
soranî - kurmancî	6234
kurmancî - soranî	1
koreyî-kurmancî	60
kurmancî-koreyî	55
rûsî-kurmancî	98
kurmancî-rûsî	103
esperanto-kurdî	807
kurdî-esperanto	1097
Bi giştî hejmara peyvan	444724

Bi saya vê statîkê em di her ferhengê da ji aliyê mezinahîyê ve çend hejmar peyvan hene agahdar dibin. Ger em li polîtîkayên weşanê ya ferhenga Tîrşîkê binihêrin divê li wêneyên jêrîn temaşe bikin:



Wêne 7. 2: Ji ferhengê ra peyv şandin

Ev dîmena wêne 7.2 nîşanê me dide ku ji bo berfirehkirina peyvên ferhenga online ya Tirşîkê, rê li ber herkesî vekîrî ye. Dema mirov bixwaze peyvekê ji ferhengê ra bişîne divê li nivîsa **+ kelime gönder** ya di jora çepê dîmenê da dihê xuyakirin bitîkîne. Bi vî awayî di ferhenga Tirşîkê da mirov dikare peyvên tune ne li ferhengê zêde bike ku ev taybetîya ferhengên înteraktîf e. Di danegha malperê da çavkaniyên ferhengê jî hatine dîyar kirin. Çavkanîyê di daneghê da dihê xuyakirin ev in:

- Dictionnaire Kurde-Français (M. Auguste Jaba)
- Ferhenga Kamêran (Kamêran Silêman Botî)
- Ferhenga Kurdî – Rusî (Qanatê Kurdo)
- Ferhenga kurdî – tirkî, tirkî –kurdî (Kemal Burkay)
- Kürtçe – türkçe – fransızca – ingilizce sözlük (Joyce Blau)
- Ferhenga destî (Umîd Demîrhan)
- Ferheng ê pişkên kurdî, kurdî – îngîlîzî – erebî (Îbrahîm Remezan Zaxoyî)
- Kürtçe – türkçe sözlük (Yusuf Ziyaeddin Paşa, amd. M. Emin Bozarslan)


Ev çavkanîyên di daneghê da wek pdf jî dikarin bihên daxistin. Herî dawî mirov dikare bibêje ku hem ji aliyê zaravayên kurdî, ji aliyê mezinahî, pîrzimanî û hem jî ji aliyê çavkaniyan û polîtîkayên weşanê ve agahiyên derbarê ferhenga Tirşîka da girîngîya xebatê radixe ber çavan. Malper bi xwe jî ev agahî nivîsîye: *‘Ferhengên kurdî yên herî mezin’*.

2.8. Ferheng Akademik

Ferhenga akademik ji aliyê Prof. Dr. Abdullah Kiran ve hatiye amadekirin. Ferhengeke zimanên kurdî – tirkî – îngîlîzî ye. Wekî dihê zanîn Abdullah Kiran, li zanîngeha Mûşê serokê beşa Têkilîyên Navneteweyî ye. Her wiha ji serê heft- heşt salan ve, ew di asta master û doktorayê de dersên Kurdî dide ku di dersên wîda da xebatên sereke ferheng û têgihnasiya hemdem e. Loma ferhenga akademîk, ji hêlekê ve jî wek xebateke hevpar û sazgehî dikare bihê hesabkirin ku birêz Kiran di vî karê da rola rêberekî dilîze.

Ferhenga akademîk, dijîtalîzekirina ferhenga bi navê ‘ferhenga zanistên civakî’ ye ku di sala 2014an da ji nav weşanên nûbiharê hatiye weşandin. Ferhenga Zanistên Civakî, ku ev ferheng jî ji aliyê Abdullah Kiran ve hatiye nivîsîn çavkanîya yekemîn a vê ferhenga online e. Ferhenga akademîk ferhengek sîncordar e; ango her peyva Kurdî tê de tune. Bi awayekî giştî, peyvên giran û akademîk tê de cih digirin.

Dijîtalîzekirina ferhenga akademîk di sala 2018an da hatiye çêkirin. Ferhenga akademîk li gor metoda amadekirina ferhengê, ferhengeke sê zimanî ye ku bi zimanê kurdî, tirkî û îngîlîzî ye û bi kurdî ravekirina peyvên jî dide. Serrûpela Ferhenga Akademîk gelek sade ye ku bi navnîşana <https://www.ferhengakademik.org/> mirov dikare bigihîje, vê ferhenga online ya li jêr hatiye nîşandan.



Wêne 8. 1: Serrûpela Ferhenga Akademîk

Wekî di wêneyê da jî dihê dîtin navê çêkerê ferhengê û zimanên ferhengê bi awayekî sade di serrûpela malperê da hatine nivîsandin. Peyva ku li qutîya lêgerînê dihê nîvasandin

ger di ferhengê da hebe bi zimanên kurdî, tirkî, îngîlîzî û tevî ravekirina peyvê der tê. Lê ger peyv di ferhengê da tunebe agahîya ku ev peyv di ferhengê da tune, wekî li jêr jî dihê dîtin bi sê zimanan (Me Nedit - Sonuç Bulunamadı - No Result) hatiye nivîsandin:

Wêne 8. 2: Encama lêgerînê ya neyînî

Li gor peyva di qutîya lêgerînê da hatiye nivîsandin, encam neyînî derkeve jî der barê ferhengê da hin agahî dide ku mezinahîya ferhengê em fêr dibin. Wekî hatiye ragihandin di ferhengê da di dora 4000î da têgih û peyv hene. “Niha hejmara peyvan derketiya dora 5000î.”²⁵ Ji bo peyvên nehatin dîtin Prof. Dr. Abdullah Kiran navîşana epostaya xwe daye ku pê ra têkevin têkilîyê. Di malperê da danasîna pirtukên birêz Kiran jî hatine kirin. Ger li têgiha hat nihêrtin, di ferhengê da hebe encama lêgerînê wek li jêrê dihê xuyakirin:

Kurdî	Türkçe	English	Ravekirin
Çavdêriya Xwezayî	Doğal Gözlem	Natural Observation	bêyf ku serî li ceribandîne û têkilîyê jî derve bê xistin, bi awayekî xwezayî bûyerên ku di derûdoreke xwezayî de pêk tên çavdêrkirin.
Raçavî	Gözetim	Surveillance	ji bo ku bi awayekî rêk û pêk tevbigerin, şopandina tevger û çalakîyên hin kes û grûban.
Civata Raçav	Gözetim Toplum	Surveillance Society	civata ku kirin û tevgerên ferdên wê ji alî hêza desthilat ve tên şopandin û belgekirin. Bi qamerayan şopandina rê û kuçeyan, perçeyek firehbûna vê çavdêriyê ye.
Çavdêrî	Gözlem	Observation	bi armanca agahdarî bidestxistinê, bi plan, bi rêbaz û bi birewerî lénêrin û lêgerîna di derbarê obje û bûyerê de.
Rêgeha Çavdêrî	İzlenim Yöntemi	Impression Management	têgih cara pêşî ji alî civaknasê Amerîkî Erving Goffman ve hat bipêşxistin. Li gor nêrina wî gava ku kes tên ba hev an hev dibinin, hingê ew jî çavdêriyên xwe yên pêşî fêm dikin bê ka gelo ew dikarin çi bi yê hember xwe re bipayivin an çi jê veşêrin.


Wêne 8. 3: Encama lêgerînê ya erênî

²⁵ Vgz. Prof. Dr. Abdullah Kiran, bi danûstandinên li ser nameyên elektronîkê (e-posta) birêz Kiran ra ev agahî hat zêdekirin.

“Herwekî dihê zanîn, termînolojiya hemdem, bi pirranî piştî Şoreşa Hunerwerî (sanayi Devrimi) li dinyayê geş bû û jê vê serdemê pê ve gellek peyvên nû hatin çêkirin. Zimanê Kurdî heta vê deme têra xwe dike, belê ji vê demê bi şûn de, ji ber nebûna dezgehên Kurdî li paş dimîne. Ji bo peyvên wekî mînak “asgarî ucret” (minimum wage) ku wateya wê di zimanê kurdî tune ye bi kesên zana re jî dihê şêwirin û divre wateyek dihê çêkirin.” (vgz. Birêz Kiran)

2.9. Ferhenga Zaravên Teknîkî

Ev ferhenga online ferhengeke teknîkî ye ku ji aliyê TMMOBê ve hatiye amadekirin. Dema têtetina navnîşana <http://endezyar.org/> ê da mirov rastî nivîsa ‘Malpera Endezyar, Avahîsaz û Plansazên Bajar ên Kurd’ dihê. Malpera ferhengê bi zimanên kurdî, tirkî, rusî, îngîlîzî û spanî di vebijêrkên da dikare bihê hilbijartin. Bi vî awayî malper, dikare xwe bigihijîne bikarhênerên çar zimanên biyanî ku ev nîşan dide ferhenga online ya endezyar xebateke berfireh e. Ev xebata di sala 2008an da hatiye çêkirin ji aliyê ruxsarî ve çar vebijêrkên (seçenek) wê û çar zimanên bijarteyên heyî berfirehiya xebatê radixin ber çavan ku li jêr dihên dîtin:



Wêne 9. 1: Di malperê da vebijêrkên zimanî û ruxsarîya malperê

Piştî agahîyên der barê malpera Endezyarê da niha em dê li ser Ferhenga Zaravên Teknîkî ya TMMOBê bisekinin. Ji aliyê zaravayên kurdî da tenê kurmancî, di ferhengê da dihê dîtin. Amadekarên ferhengê lîsteya ferhengan çêkirine, ku di heşt lîsteyan da bêjeyên ferhengê dabeş kirine. Li gor dabeşkirina malperê, lîsteya ferhengan ev in:

- Fasîkul 1
- Fasîkul 2 (Kurdî - Pênase)
- Fasîkul 2 (Kurdî – Tirkî)
- Fasîkul 2 (Kurdî – Îngîlîzî)
- Peyvên ku Hûn Dişînin

- Zaravên Matematikê
- Ferhenga Zaravên Teknikî (Kurdî – Tirkî)
- Ferhenga Zaravên Teknikî (Kurdî – Îngîlîzî)

Bi vî awayî mirov dikare bibêje ku ferheng ji peyvên kurdî wateya du zimanan (tirkî û îngîlîzî) dikare bide. Li gor vê listeyê, qutîya lêgerîna da vebijêrk hene ku bi saya hîlbijartina van kategorîyan peyvên ku dihê gerandin dikare hêsantir bihê dîtin. Di her listeyê da çend heb peyv hene hatine dîyarkirin ku li gor daneyên hatine dayîn di malperê da 26.669 peyv hene. Di serrûpela (home page) malpera ferhengê da ji van ferhengan yê nû rojanebûne (update) dihên dest nîşan kirin.



Wêne 9. 2: Serrûpela Ferhenga Zaravên Teknikî

Di serrûpelê da *peyvên nû rojanekirî* û *yên nû li zêdebûyî* jî dihê xuyakirin. Di rûpela *Em kî ne?* (about) da bi hevokeke bi zimanê tirkî wisa hatiye nivîsîn:


“Bir grup Kürtçe gönüllüsü teknik insan Kürtçe teknik terimlerin standardize edilmesini üstlenmiş.” (Komek ji kesên teknîkî yê dilxwaz ên kurd, standardîzasyona têgehên teknîkî yê kurdî girtine ser xwe).

Me di serî da gotibû ku malper bi çar zimanan dikare bihê xwendin ku dema em zimanê kurdî hildibijêrin derheqê amadekirina ferhengê da rastî vê nivîsê dihên:

“Ev bi salan e li ser zimanê Kurdî zilm û zor heye. Serdestên welatê me herdem xwestine hebûna gelê Kurd înkâr bikin, di serî de jî zimanê Kurdî qedexê kirine. Gelê Kurd herdem hewl daye ku zimanê xwe pêş bixe û bi zimanê xwe

perwerdehiyê bike. Perwerdehiya bi zimanê Kurdî ji bo me Kurdan tişteki jênegir e. TMMOB jî herdem tîne ziman ku perwerdehiya bi zimanê zikmakî tişteki ferz û jênegir e. Ji bo nebûna perwerdehiya bi zimanê kurdî termînolojiya perwerdehiyê jî standart nebûye. Ev jî dibe zor û zehmetiya destpêka perwerdehiyê bi Kurdî. Ji bo ku perwerde bi Kurdî hebe divê meteryal û pirtûkên perwerdehiyê jî hebin. Ji bo hemû ast û waneyan divê pirtûkên cuda hebin. Tişteki gelek girîng; divê zaravên ku di van pirtûkan de tîne bikaranîn jî heman bin. Meteryalên perwerdehiyê pir hesasin, ne wek roman an jî helbestekî ne. Ji bo derûniya zarokan û ji bo perwerdehiyê zanistî divê zaravên pirtûkan standart bin. Komek Kurdîhezên teknîk ku di aliyê ziman de xwe kirine bin barê standardîzekirina zaravên teknîkî yên Kurdî.”

Dîyare ku zaravên teknîkî yên kurdî her çiqas ji aliyê sazîya TMMOBê ve hatibe amadekirin jî bi saya komek kurdîhezan ev xebat derketiye holê. Van kurdîhezan ji bo perwerdehiya zimanê zikmakî vê xebata ferhengê danîne pêşîya xwe. Lê ji bo çavkaniyên ferhengê em di malperê da rastî agahîyan nayên ku ji bo lêkolîna me agahîyek girîng e. Her çiqas çavkaniyên ferhengê nehatibin dîyar kirin jî ji aliyê berfirehkirina peyvên ferhengê da nîşane hene ku mirov dikare bibêje ferhengeke înteraktîf e. Dema wateya peyvekê nîşan dide her wiha ji bo sererastkirina wî an ji bo şandina peyvekê derfetê dide ku mirov bi wan ra bikeve têkilîyê. Di wêneyê jêr da dihê dîtin ku, dema şandina peyvekê li ‘Peyvek bişîne’ dihê tikandin û ji bo sererastkirinê jî li ‘Çewtiyê ragihîne’ dihê tikandin.



Wêne 9. 3: Sererastkirina peyvê û şandina peyvekê di ferhenga malepera endezyarê da

Di ferhengê da ger peyva ‘*kadibûn (cîhanîbûn)*’ û wateya wî çewt hatibe nivîsandin ji ber înteraktîfiya ferhengê rê li ber sererastkirinê vekirîye. Lê dîsa jî mirov nikare bibêje ku ferhengeke bi temamî înteraktîf e ku her kes nikare peyvan li ferhengê zêde bike.

Ferhenga online ya Ferhanga Zaravên Teknîkî, ferhengên kurdî – tirkî û kurdî – îngîlîzî du heb ferheng di xwe da dihevine ku bi gelemperî taybetîyên ferhengê li jorê hat dayîn.

2.10. Ferhenga Hakkarim

Ferhenga online ya malpera Hakkarim, ferhengeke du zimanî ye. Ferhengeke kurdî – tirkî û tirkî – kurdî ye. Di wêneya jêrîn da wekî dihê dîtin zimanê malperê tirkî ye.



TÜRKÇE KÜRTÇE SÖZLÜK

Aranan Kelimeler Kürtçesini ▾

[Popüler Türkçe kelimeler](#) [Popüler Kürtçe kelimeler](#) [Kürtçe Dil Testi](#)


Wêne 10. 1: Serrûpela ferhenga malpera Hakkarim

Malper tenê ji yek rûpelê pêk dihê ku der barê ferhengê da ev agahîyên jêrîn tê da hatine dayîn:

“Sözlük veritabanı toplam 26 bin kelimededen oluşmaktadır. Bu sayfa hızlı arama için AJAX ile kodlanmıştır. Birden fazla kelimeyi aralarına boşluk bırakarak arama kutusuna yazıp kelimenin anlamının tek seferde arayabilirsiniz. Kelimeleri ekleriyle değil master haliyle yazarsanız sözlük anlamını bulmanız daha kolay olacaktır. Örneğin “gidiyor” kelimesi yerine “gitmek” şeklinde arayınız.”

Danegeha ferhengê bi temamî ji 26 hezar peyvan pêk dihê. Ji bo lêgerîna bilez ev rûpel bi teknolojiya AJAXê hatiye çêkirin. Ji yekê zêdetir peyv di navbera wan da valahî di qutîya lêgerînê da hatibe dayîn, ferheng dikare di yek carî da wateya

peyvên nivîsandî bide. Ji bo wateya ferhengî yên peyvan hêsantir bihê gerandin, peyv di rewşa raderê da bihê nivîsandin dê baştir bibe.




Wêne 10. 2: Encama lêgerîna çend peyvên bi hev ra

Bi saya bikarnîna teknolojiya AJAXê lêgerîna wateya çend peyvan bi hevra dikare bihê kirin ku mînaka vê jî di wêneya jorîn da dihê xuyakirin. Malpera ku teknolojiya AJAXê bikarbîne, bêyî hewceyê tevahîya rûpelê dikare daneyê bişîne û encamê jê bistîne. Ji xeynî van agahîyên di malperê da hatine dayîn, derbarê ferhengê da em rastî daneyan nayên ku çavkanîya ferhengê û polîtîkayên weşanê nîşanê me bide. Ev ferheng ji xeynî zaravayê kurmançî cih nedaye zaravayên kurdî yên din û ji aliyê kî ve hatiye çêkirin jî ne dîyar e.


2.11. Ferhenga Zkurd

Bernameyek e ji bo veguherandina nivîsên latinîyê ji bo nivîsa erebîyê ye. Girêdayî malpera zkurd.orgê ye. Nivîsên ku bi tîpên latinî hatine nivîsandin dema li bişkoka *bigore* (بگوره) bihê tikandin di encamê da heman nivîsa bi tîpê erebî dide mirov.



Wêne 11. 1: Rûpela veguherandina nivîsên latinîyê ji bo soranî

Wekî mînak em li ser rûpelê cihê nivîsandinê hevoka ‘*kevir avêt çavê min, lê lêneket*’ binivîsîn di encamê da ev hevok dê bi tîpên erebî were nivîsandin ku di wêneyê jêrîn da dihê xuyakirin.




Wêne 11. 2: Mînaka veguherandina tîpên latinî

Navnîşana malperê <http://www.zkurd.org/Amino/l2s.php> niha li berdest e. Derbarê wê da aghîyên zêdetir nehat peyde kirin ku di yare mirov tenê tîpguhezîyê dikare bike. Lewre wek ferhengek nikare bihê pejirandin. Lê ji ber ku wek online ji bo zimanê kurdî fonksiyonek bi kar tîne me wê jî di vir da bi cih kir.

2.12. Ferhenga Microsoftê

Microsoft Language Portal (Navgîna Ziman ya Microsoft), ferhengeke têgihên kompûtergerîyê ye. Ferhenga online ya Microsoftê ferhengeke pirzimanî ye û 116 ziman tê da dihên dîtin. Ev ferhenga online di sala 2009an da ketiye xizmeta gel. Microsoft, gelek amûrên ziman, çavkanîyan û çareserîyên belaş peyda dike, ku dikare ji herkesî ra bibe alîkar da ku mirov qala tîkîliya di navbera ziman û teknolojîyê da bike. Di qada bernameyên kompûteran da ferhenga Microsoft alîkarî dide ji sedî zêdetir zimanan ku cih daye zimanê kurdî jî.

Ferhenga online ya Microsoftê ji bo zaravayê soranî ye. Wekî ku dihê zanîn Wîndowsa bi soranî heye û di kompûteran da dihê bikaranîn. Navnîşana malperê <https://www.microsoft.com/en-us/language> e ku li jêr serrûpela wê dihê xuya kirin.



Wêne 12. 1: Serrûpela lêgerînê ya ferhenga Microsoftê

Di nav vebijêrkên zimanan da, navê zaravayê kurdîya soranî wekî; ‘*Central Kurdish*’ (*kurdîya navendî*) hatiye nivîsîn. Ferhengeke du zimanî ya kurdî –biyanî û biyanî – kurdî ye. Peyv û têgihên bi soranî mirov dikare di vê ferhengê da bibîne. Herwiha di ferhengê da cihên ku ev peyv derbas dibin jî dihêne nîşandan. Ji bo wergerên termînolojîya komûtergeriyê bi kêr hatî ye.

Translations in Localized Microsoft Products		
English ↑↓	Translation	Product
Software	نهرمه و آله	Windows 10 Anniversary Update
Software	نهرمه و آله	Windows 8.1 Group
Software	نهرمه و آله	Windows 10
Device software	نهرمه و آله ی نامپیر	Windows 10 Anniversary Update

Wêne 12. 2: Encama lêgerînê di ferhenga Microsoftê da

Piştî werger dihê kirin li binê encamên wergerînê nivîsa: “Wrong terminology? Do you think we can improve our translations in your language? Send us your feedback.” (Termînolojîya xelet? Ma hûn difikirin ku em dikarin wergera xwe bi zimanê we çêtir bikin? Bersivên xwe ji me re bişînin). **dihê dîtîn.**

Bi vî awayî derbarê wergerê da mirov dikare bi ferhengê ra têkîlî dayne. Lê ji bo li ferhengê peyv lêzedkirinê ewqas bikêrhatî nîn e ku divê hesabekî me yê microsoftê hebe. Lewra ferhengeke înteraktîf nîn e ku herkes bikaribe ferhengê berfirehtir bike.

Li gor agahîyên malperê Microsoft, di sala 2012an da di xebatên kompûtergerîyê da ji bo zimanê kurdî cih daye termînolojîya zaravayê soranî. Çavkanîyên ferhengê ji ku hatine sitendin an di amadekirina termînolojîya kompûterê da kî cih girtîye ne dîyar e. Her wiha hejmara peyvên di ferhengê da jî nehatîye dîyar kirin. Lê ji ber ku li ser sedî zimanan da ev ferhenga online dikare wergerê bike, mirov dikare bibêje ku ji aliyê qebareyê ve danegaha ferhengê mezin e.

2.13. Ferheng.org

Ferhengek kurmancî – tirkî, kurdî – înglîzî, kurdî – elmanî û zazakî – tirkî ye ku çar ferheng tê da hene. Tê da ne tenê ferheng, çend projeyên din jî hene ku em dê niha wan bidin nasîn. Lê berîya danasîna van projeyan em dê li ser ferheng.orgê hinek bisekinin. Kurmancî û zazakî du zaravayên kurdî di ferhengê da hene û bi her du zaravayan wateya peyvên bi zimanê înglîzî, tirkî dihên nîşandan. Serrûpela malpera ferhengê li jêr dihê xuyakirin.



Wêne 13. 1: Serrûpela malpera ferheng.org

Her çiqas di vê serrûpela ferhengê da agahîyek tunebe jî, ji bo ferhengê di projeya *legerin.ferheng.org*ê da çend heb agahî mirov dikare bi dest bixe.

2.13.1. Legerin.ferheng.org

Ev navnîşana ji bo lêgerîna peyvan yê girêdayî malpera ferheng.orgê ye. Zimanê malperê kurdî ye lê mirov dikare veguherane zimanên tirkî, înglîzî û elmanî. Her wiha zimanê malperê li zaravayê zazakî jî dikare bihê veguherandin. Bi navnîşana <http://legerin.ferheng.org/?pg=home> ev rûpel niha berdest e ku li jêr rûpela malperê dihê xuyakirin.



Wêne 13. 2: Rûpela lêgerîn ya malpera ferheng.org

Mirov dema bixwaze zimanê malperê biguherîne li alayên kurd, îngîlîz, tirk, elman bitikîne, dê malper li gor vê zimanê xwe biqulibîne ser wî zimanî. Her wiha ji bo peyvek şandina ferhengê li nivîsa **+ Peyvek Pêveke** dikare bihê tikandin.

2.13.2. Tools.ferheng.org

Bernameyek veguherandina nivîsên kurdîya erebî yê ji bo kurdîya latinî ye. Ev jî wek *legerin.ferheng.org* girêdayî malpera ferheng.orgê ye. Bi saya vê bernameyê nivîsên ku bi tîpên erebî hatine nivîsîn beramberên wan ên bi tîpên latinî dikare bihê dîtin. Bi navnîşana <http://tools.ferheng.org/arablatin.php> da mirov dikare xwe bigihîne vê malperê ya li jêr dihê dîtin.



Wêne 13. 3: Rûpela kurdîya erebî – kurdîya latinî ya ferheng.org

2.14. Ferhenga Kurdonline

Ferhenga online ya kurdî – rûsî û rûsî – kurdî ye. Navnîşana malpera ferhengê <http://kurdonline.ru/> da niha li berdest e û zimanê wê bi rûsî ye. Di sala 2012an da hatiye amadekirin ku agahîyên derbarê ferhengê da em, ji malperê bi xwe van hevokan fêr dibin:

“Kurdonline.ru - malpera ferhengoka kurdî ji zimanê rûsî ya yekemîn li ser tora Internet di 31 adarê sala 2012 xebata xwe despêkir. Bi taybet ji bo gelê Kurd ên Rûsya û komarên din ê Sovêta berê hat avakirin. “Ew malper nêt û armançên xwe ê ku daniye li ser binyata edetîyên zimanê kurdî û bi taybet zaravên soranî û kurmançî. Ser ew malper her mirovek dikare hemû xizmetgehên fayîde bikar bîne: ji online ferhengok heya pirtûkgeha mezin. Paşwextî de dîsa jî vê fesilên rûpelên nû vebin û her kes jî dîsa dikare me re bibe alîkar ser hemû xebatên ziman. Hûn dikarin me re dosyên nû bişînin, piştî ku em bikaribin wan parvekin. Her pirs û daxwezîyên xwe hûn dikarin bi rêka e-peyam: temur.maxmudov@mail.ru an jî peyama tora civakî: <http://vk.com/kurdonline> re bişînin hevkarê malperê Têmûr Maxmûdov. Û dîsa jî li ser tora civakî vk.com koma <http://vk.com/kurdishlanguage> КУРДСКИЙ ЯЗЫК - ZIMANÊ KURDÎ bi me re hevkarîya xebatê dike.”


Li gorî agahîyên jorîn (hem bi kurdî hem bi rûsî hatiye nivîsîn) ferhenga Kurdonline, li ser înternetê yekemîn ferhenga kurdî – rûsî ye. Ji aliyê Têmûr Maxmûdov ve di adara sala 2012an da dest bi weşanê kiriye.



Wêne 14. 1: Serrûpelê da lêgerîna peyvan di ferhenga Kurdonlineê da

Di wêneyê da wekî ku dihê dîtin bi zimanê rûsî û kurdî wiha hatiye nivîsîn: ‘*Ferhengoka Kurdî-Rûsî û Rûsî-Kurdî. Jimara xwe da 34000 peyve.*’ Li serîya qutîya lêgerîne bi zimanê rûsî ‘*КУРДСКИЙ СЛОВАРЬ*’ (Ferhenga Kurdî) bi tîpên mezin hatiye nivîsîn. Her wiha li jêrê bi rûsî ‘*Стать участником проекта и редактировать словарь вы можете в разделе «редактор словаря».*’ (Hûn dikarin bibin endamê projeyê û li ser beşa "Edîtorê Ferhengê" wergerandinê bikin.)

Di bin banê van agahîyan da mirov dibîne ku ev ferheng, ferhengeke înteraktîf e. Ji bo herkes bikaribe wergera peyvan bike di serrûpelê da qutîka peyv şandinê hatiye amadekrin. Ev qutîka peyv şandinê li jêr hat dayîn:



Wêne 14. 2: Cihê peyv li ferhengê zêdekirinê

Di wêneyê da li milê çepê nivîsa ‘*Вы можете добавить новое слово в словарь*’ (Hûn dikarin peyvekê nû li ferhengê zêde bikin) heye. Dema li qutîya ‘*новое слово:*’ (peyva nû:) peyvek nû bihê nivîsandin li binê qutîka ‘*перевод:*’ (werger:) dê wergera peyvê bihê nivîsandin û bihê şandin. Li aliyê rastê yê qutîya peyv şandinê, di bin sernavê ‘*случайная выборка из словаря:*’ (Ji ferhengê peyvên ketûber) da hin peyvên kurdî bi wergerên zimanê rûsî hatine nîşandan.

Di serrûpelê da biwêj û gotinên pêşîyan jî yên kurdî bi zimanê rûsî hatine nivîsîn dihên dîtin. Her wiha di malperê da rûpelên kovar û rojname, rêziman û hwd. jî hatine bicihkirin. Derbarê çavkanîyên ferhengê da agahîyek di malperê da nehat peyda kirin. Peyvên kurdî yên di ferhengê da bi zaravayên kurmancî hatine dayîn lê wek di danasîna malperê da jî hatiye gotin armac û binyada xebatê li ser zaravayên kurmancî û soranî ne.

2.15. Ferhenga Kurdî Tirkî


Ferhengeke kurdî – tirkî û tirkî – kurdî ye ku ji aliyê kesekî bi navê Suleyman ve hatiye amadekirin. Zimanê malperê tirkî ye û di malperê da di binê sê sernavên *Genel sözlükler* (Ferhengên giştî), *Yerel sözlükler* (Ferhengên herêmî) û *Eskî sözlükler* (Ferhengên Kevin) da neh heb ferheng dihê dîtin. Du heb ji wan jî ferhengên kurdî ne ku di navnîşana <http://dictionary.suleyman.cc/kurtce.php?d=krtr&find=ok&w=kevir&t=1> da niha li berdest e.

Serrûpela ferhengê li jêr hat dayin ku di ferhengê da em tenê rastî zaravayên kurmancî dihên:



Wêne 15. 1: Serrûpela ferhenga *Tirkî-Kurdî*

Ferhengên tirkî – kurdî û kurdî – tirkî, di bin sernavê *Yerel sözlükler* (Ferhengên herêmî) da hatiye bicihkirin. Her çiqas ji bo ferhengên din (îngîlîzî – spanî, îngîlîzî – tirkî û hwd.) hejmara peyvan hatibin dayîn jî derheqê hejmara peyvên di ferhengên kurdî da ti agahîyek nehatiye dayîn.



Wêne 15. 2: Ferhengên di malpera Suleyman da

Wekî di wêneyê da jî dihê dîtin piştî xêrhatinek bo ferhengê ev agahîya jêrîn hatiye nivîsîn:

“Suleyman'in Sözlüğü, bir grup CopyLeft sözlükten oluşur. Bunlardan bazıları İngilizce, İspanyolca vs. gibi uluslararası dillerdeki, bazıları Tatarca gibi yerel, bazıları da Osmanlıca gibi eski dillerdeki sözlüklerdir.”(Ferhenga Suleyman ji komek ferhengên CopyLeft pêk dihê. Hin ji van ferhengên zimanên navneteweyî yê wekî îngîlîzî, spanî ne, hin ji ferhengên wekî tatarî herêmî ne û hin ji wekî zimanê Osmanî yê zimanên kevnare ne).

Li herî jêra wêneyê jî bi zimanên îngîlîzî û tirkî nivîsek: ‘*Hiçbir hakkı saklı değildir. İsteyen istediği şekilde kullanabilir.*’ (Tu mafekî wê parastî nîne. Kesê dixwaze bi her awayî dikare bikarbîne.) hatiye nivîsîn. Ev taybetîyên bernameyên Copyleft in ku ew di nivîsa danasînê da hatiye dîyar kirin. Çawa dihê zanîn malperên di înternetê da piranî di bin lîsansa

Copyright da ne û ev dihê wateya ku weşanên dihên kirin temamî di bin parastîna huquqî da ne an mafê wan ên telîfê heye. Lê ji bo *Copyleft*'an ev ne derbasdar e ku dikarin bihêsanî werin bikaranîn.

Ji aliyê mezinahîyê ve û derbarê çavkanîyên ferhengê da agahî nehatine dayîn. Her wiha dema çêkirina ferhengê jî nehatîye dîyar kirin. Berfirehkirina bêjeyên ferhengê ne pêkan e ku ev ferheng, ferhengek înteraktîf nîn e.

ENCAM Û NIRXANDIN

Di vê beşê da, li ber daneyên ji malperên ferhengên kurdî yê online derketine em dê encamên xebatê û nirxandinên xwe li ser van panzdeh ferhengên kurdî pêşkêş bikin.

Armanca me di vê xebatê da ew bû ku di nav çarçoveya ferhengnasîyê da, geşedanên serdema înfomatîkê ji aliyê kurdan ve çawa hat bikaranîn ku bi ferhengên kurdî yê online înternetê bi kar tînin, nirxandineke giştî bikin. Li vê derê encamên ji vê xebatê derketine holê em dê li gorî şêwaza çendanî bi şeş pirsên ji bo van ferhangan hatin amadekirin bibersivînin.

Bi giştî em dikarin bibêjin, ferhengnasî ku xebatên xwe di du qadên *lêkolînên ferhangan* û *amadekirina ferhangan* da dike wek zanistekê serbixwe ji geşedanên serdema enformatîkê para xwe sitand. Ferhengên elektronîk cihê ferhengem çapkirî girtin û niha yê piranî ji aliyê bikarhêneran ve dihên pejirandin ferhengên online in. Zimanê kurdî jî ku bê statu ye û xwedî zimanekî perwerdeyê nîn e ji van guherînan sûd wergirt ku bi ferhengên online, xebatên ferhengnûsîya kurdî li gorî daxwaza demê rojane kir.

Di vê lêkolîna me da bi tevahî li ser înternetê, panzdeh heb ferhengên kurdî yê online hatin peyda kirin. Yekem ferhenga kurdî ya li ser înternetê hatiye amadekirin û weşandin *Wikîferheng* e. Piştî Wikîferhengê (2004) bi taybetî ji salên 2010an şûn de hejmara van ferhengên online zêdetir bûne ku di demên cîyawaz da hatine amadekirin. Di vê xebatê pirsên; ev ferheng ji aliyê kê ve û kengî hatine amadekirin, kîjan zaravayên kurdî di xwe da dihewînin, çavkanîyên wan, mezinahîya wan û hwd. hatin bersivandin. Ji ber ku çavkanîya yekemîn a vê xebatê malperên ferhengên online bûn bi qasî agahîyên hatibûn dayîn, me karibû daneyan berhev bikin. Bi tevî van daneyan em dê encamên vê xebatê di tabloyên jêrîn da destnîşan bikin.

Tablo 1: Li Gorî Zaravayên Zimanê Kurdî Ferhengên Kurdî yê Online

<i>Zaravayê Kurmancî</i>	<i>Zaravayê Soranî</i>	<i>Zaravayê Zazakî</i>	<i>Zaravayên Din</i>
<ul style="list-style-type: none"> • Ji xeynî <i>Ferhenga Microsoftê</i> hemû ferhengên kurdî yê online da zaravayê kurmancî dihê dîtin. 	<ul style="list-style-type: none"> • Wikîferheng • FerhengaMicrosoftê • The Kurdish Dictionary • MyMemory Translated • Ferhenga Tîrşîk Netê 	<ul style="list-style-type: none"> • Wikîferheng • Ferheng.org • Ferhenga Tîrşîk Netê 	<ul style="list-style-type: none"> • Wikîferheng

Wekî encam, di tabloyê da jî dihê dîtin zaravayê herî pir di amadekirina ferhengan da hatiye bikaranîn zaravayê kurmancî ye. Tenê di Ferhenga Microsoftê da zaravayê kurmancî cih negirtîye. Yê zaravayê soranî tê da dihê dîtin cih dane zaravayê kurmancî jî ango hem soranî hem kurmancî bi hevra dihên dîtin. Dîsa Ferhenga Tirşik netê da zaravayên kurmancî, soranî û zazakî dihê dîtin ku zaravayê zazakî li wergerê zêde kiriye. Her wiha yê hemû zaravayan di xwe da dihewîne tenê ferhenga Wikîferheng e ku mirov rastî peyvên zaravayên goranî, lekî, feylî û hwd. jî dikare bihê.

Tablo 2: Li Gorî Amadekaran ve Ferhengên Online û Dema Weşandina Wan

<i>Sazî</i>	<i>Şexsî</i>	<i>Pargîdanî</i>
<ul style="list-style-type: none"> • Ferhenga Zaravên Teknîkî (TMMOB – Enqere – 2008) • Ferhenga Enstîtuya Kurdî ya Parisê (EKP – Paris - ?) 	<ul style="list-style-type: none"> • Wikîferheng (2004) • The Kurdish Dictionary (2017) • Ferhenga Tirşik Netê (2013) • Ferhenga Akademîk (2018) • Ferhenga Hakkarim • Ferheng.org (?) • Ferhenga Zkurd (?) • Ferhenga Kurdonline (2012) • Ferhenga Suleyman (?) 	<ul style="list-style-type: none"> • MyMemory Translated (Kalifornîya û Roma - ?) • Glosbe Translated (Polonya - ?) • FerhengaMicrosoftê (Washington – 2012) • Google Translated (San Fransîsko – 2016)

Me li gorî amadekarên ferhengan, ferhengên online wekî yê ji aliyê sazî, pargîdanî (şirket) û şexsan ve hatine amadekirin kategorîze kir. Wekî di encamê da dixuyê ferhengên kurdî yê online piranî ji aliyê şexsan ve hatine amadekirin û hejmara wan heşt heb in ku di nav ferhengên temamî da rêjeya wan sedî 60 e. Hejmara yê ji aliyê pargîdanî ve hatine amadekirin du qatê yê sazîyan e ku du ferheng ji aliyê sazîyan ve û çar heb jî ji aliyê pargîdanî ve hatine amadekirin.

Tablo 3: Li Gorî Înteraktîfîyê ve Ferhengên Kurdî yên Online

<i>Ferhengên Înteraktî</i>	<i>Ferhengên Ne Înteraktîf</i>	<i>Ferhengên Nîv Înteraktîf</i>
<ul style="list-style-type: none"> • Wikîferheng • MyMemory Translated • Glosbe Translated 	<ul style="list-style-type: none"> • The Kurdish Dictionary • Ferhenga Enstîtuya Kurdî ya Parisê • Ferhenga Hakkarim • Ferheng.org • Ferhenga Zkurd • Ferhenga Suleyman 	<ul style="list-style-type: none"> • Ferhenga Tirşik Netê • Ferhenga Akademîk • Ferhenga Kurdonline • Ferhenga Zaravên Teknikî • Ferhenga Microsoftê • Google Translated

Di ferhengên online da bikarhêner jî dikarin peyvan li ferhengê zêde bikin. Lê ev taybetî di hemûyan da nayê dîtin. Di nav ferhengên kurdî yên online da li gor vê taybetîya înteraktîfîyê ve ferhengên online, di tablaoyê da hatin dabeşkirin. Yê bi temamî peyv lêzêdekirin ne pêkan e me wekî *Ferhengên Ne Înteraktîf* û yê peyv lêzêdekirin pêkan in jî wekî *Ferhengên Înteraktîf* pênase kir. Her wiha tenê bi rêya epostayê an bi endambûneke dijwar peyv lêzêdekirinê rê vedikin ra *Ferhengên Nîv Înteraktîf* hat gotin. Ji aliyê vê taybetîyê ve ferhenga herî serkeftî Wikîferheng e.

Tablo 4: Li Gorî Dîyarkirina Çavkanîyan ve Ferhengên Kurdî yên Online

Yên Çavkanîyên wan Dîyarkirî	Yên Çavkanîyên wan Nedîyarkirî
<ul style="list-style-type: none"> • Wikîferheng • The Kurdish Dictionary • Ferhenga Tirşik Netê • Ferhenga Akademîk 	<ul style="list-style-type: none"> • MyMemory Translated • Glosbe Translated • Ferhenga Enstîtuya Kurdî ya Parisê • Ferhenga Hakkarim • Ferheng.org • Ferhenga Zkurd • Ferhenga Suleyman • Ferhenga Kurdonline • Ferhenga Zaravên Teknikî • Ferhenga Microsoftê • Google Translated

Di amadekirina ferhengên online da hin amadekar çavkanîyên ferhengê xwe dest nîşan kirine. Lê hinek ji wan jî derbarê çavkanîyên ferhengê da tu agahîyek zelal nenivîsîne. Me di vê tabloyê da li gor ferhengên çavkanîyê wan dîyarkirî ne dabeş kir û wekî ku dihê dîtin tenê çar ferhengên kurdî yên online da çavkanî hatine dest nîşan kirin.

ÇAVKANÎ

1. Pirtûk û Gotar

- ADAK, P. (2015). *Destpêka Edebîyata Kurdî ya Klasîk*. Stenbol: weş. Nûbihar.
- BASKIN, S. (2014). Türkiye ve Dünyada Sözlük Bilimi. *International Journal of Language Academy c. 2/4*, 445-457.
- BASKIN, S., & BİROL, G. (2017). Sözlük ve Sözlük Kullanıcıları: Hangi Sözlük Kimin İçindir? *Turkish Studies j.12/15*, 135-160.
- BERGENHALTZ, H., & wer. CORGA, E. (2013). Sözlük Nedir? What is Dictionary? *Lexikos, c.22*, 20-30.
- BOZ, E. (2011). Leksikografi Teriminin Tanımı ve Türkçe Karşılığı Üzerine. *Dil ve Edebiyat Araştırmaları Dergisi, j.4*, 9-14.
- BULELLÎ, N., & ERTEKİN, N. (2017). Ferhengên Menzûm Di Edebiyata Kurdî De. *Bingöl Üniversitesi Yaşayan Diller Enstitüsü Dergisi c.3 s.5*, 21-44.
- BURINESSEN, M. V. (1985). Onyedinci Yüzyılda Kürtler ve Dilleri: Kürt Lehçeleri Üzerine Evliya Çelebinin Notları. *Studia Kurdica*, 13-31.
- GARZONI, M. (2014). *Gramatica E Vocoboloria Della Lingua Kurde*. Stenbol: weş. Avesta.
- IŞIK, Ü. (2015). Lêkolînek Li ser Ferhengên Kurdî. *Muş Alparslan Üniversitesi Sosyal Bilimler Dergisi, c: 3 s.1*, 1-15.
- KARADEMİR, F., GÜMÜŞ, N., & KORKUT, A. (2014). *Türkçe - Kürçe . Kürçe - Türkçe Sözlük, Ferheng Kurdî - Tirkî . Tirkî - Kurdî*. Enqere: TDK Yayınları.
- SERT, G. (2019). Eletronik Sözlük Tipolojileri ve Lexica Örneği. *Uluslararası Türk Dili ve Edebiyatı Araştırmaları Dergisi b.7, j.17, r. 58-70*.
- ZEYTİNKAYA, D., & DEMİRKIRAN, M. (2016). Sözlük Bilimde Yeni Teknolojinin Yeri. 1-14.

2. Çavalaniyên Dijital

<https://ku.wiktionary.org/wiki/Wikîferheng>

<https://www.thekurdishdictionary.com/en>

<http://www.turckekurtcesozluk.com/>

<https://mymemory.translated.net/>

<https://translate.google.com/>

<https://www.ferhengakademik.org/>

<https://ku.glosbe.com/>

<https://www.institutkurde.org/ku/wesan/kurmanci/ferheng/>

<http://www.endezyar.org/>

<https://www.microsoft.com/en-us/language>

<http://www.zkurd.org/Amino/>

<https://www.hakkarim.net/cgi-bin/yenisozluk.cgi/goste#%C3%BCst>

<https://www.armadigital.net/bilgi-bankasi/internetin-tarihcesi>

<https://dijilopedi.com/2019-turkiye-internet-kullanim-ve-sosyal-medya-istatistikleri/>

<http://candname.com/>



T. C.

Mardin Artuklu Üniversitesi
Türkiyede Yaşayan Diller Enstitüsü
Kürt Dili ve Kültürü Anabilim Dalı

Tezsiz Yüksek Lisans Projesi

ÇEVİRİMİÇİ KÜRTÇE SÖZLÜKLER -NİCEL BİR ARAŞTIRMA-

Tekoşin AYDENİZ
18721006

Danışman
Dr. Tareq Mohammed AWRAHIM

Mardin 2020